



Nêz û dûr

Belê, bayê êvarê yê ku bêhna agirek ji dûr tîne dibêje; "Ji nêz ve her tişt normal e, gere hûn ji dûr ve mêze bikin" lê nivîskar xwe dixeyidîne. Belam em dizanin ku her du jî rastiye dibêjin. Carna ne nêz, ne jî dûr têra dîtîne dike... *Mizgin Ronak / RÛPEL - 2*



Sartre û Osman Sebrî

Bi qasî ku em pê dizanin - û dinya û alem jî pê dizane -, Sartreyê fransî û Osman Sebrîyê kurdistanî bi tu awayî leqayî hev nehatine, ne di saxîya xwe de ne jî piştî mirinê! Ne li bajarekî Fransayê û ne jî li gundekî Kurdistanê!... *Şener Ozmen / RÛPEL - 11*



Efendiyan welatê jor

Wexta min diroka Xaltî-Ûrartûyan vekoland, yek caran ez bextewar bûm, yek caran xemgîn bûm, yek caran kelecane ez girtim û yek caran jî he-nase/bîhn li min çikiya. Li ser rûyê vê dinyalîkê, ti şaristaniyeke din weke Ûrartûyan ev çend mu-tewazî nehatiye dîtîne... *Agît Yazar / RÛPEL - 12*

Rojnameya Heftane

www.xwebun.org

xwebûn

3 - 9 Sibat 2020

Hejmar: 7

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

Erdhejê rastî derxistin holê



Li bajarên Xarpêt û Meletiyê bi pileya 6.8 erdhej pêk hat û di encamê de 41 kes mirin û bi dehan kes jî birîndar bûn. Di vê erdhejê de derket holê ku Kizilay pereyên jê re tîn bexşkirin, li saziyên nêzî desthilatê belav dike. Aqûbeta bacên ku ji bo erdhejê tîn dayîn nayê zanîn. Alîkariya ku şaredariya Erxenyê şand hat astengkirin. Her wiha berdevkên hikûmetê li ser kavi û cenazeyan siyaset kirin... *Nûçe-analîza Qedrî Esen / RÛPEL - 3*

Vîrûs li cîhanê belav dibe

Li bajarê Wuhan ê Çînê vîrûseke nû derket holê. Di kesên ku ev vîrûs lê peyda bûye de enfeksiyona rêya hilmijînê tê dîtîne. Ev vîrûs di nav çend hefteyan de bi lez û bez belav bû û ji bilî Çînê, di heman demê de heta niha li zêdetir 16 welatên din hatiye tespîtkirin. Mirinên bi sedema vê vîrûsê her ku diçe jî zêdetir dibin. Vîrûsa ku ewil di meha kanûnê de hatiye tespîtkirin, weke '2019-nCoV' tê bi-navkirin... *RÛPEL - 6*

Dixwazin jinan bêbîr bihêlin

Pêvajoya xwebirêxistinkirinê ya baviksalariyê, bi tunekirin, berovajîkirin û bêqedirkirina nîrx û destkeftiyên jinan re pê de çûye. Ya herî girîng jî, hewl dane jiyana ku jin afirînerên wê ne, pê bidin jîbîrkirin. Xwestine jinan bêbîr bihêlin. Xwestine jiyana ku tê de jinan nîrx û çanda xwe ji bîr kiriye, biafirînin û jinan di nav vê jiyana "nû" de bêbingeh û bînîrx bikin û bi nîrxên baviksalariyê wan tev li jiyane bikin... *Derya Bawer / R.2*

'Li gor min dengbêjî derman e'

Hunermanda kurd Tara Mamedova pirsên rojnameya Xwebûnê bersivandin. Çîroka malbata Tara Mamedova ya sirgûnkirinê, ji Bazîde ya Agiriyê dest pê dike û heta Kirgizistan û Rûsyayê didome. Mamedova têkildarî huner û jiyana xwe ev tişt anîn ziman: "Her kurdekî/e sirgûnê gelek êş kişandine û tişt ku li sirgûnê

dilê me hindik be jî rehet kiriye, dengbêjî ye. Dengbêjî li gor min derman e û her mirovê/a ku xwe pê derman dike bextewar e. Ez dibêjim bextewarî lê bextewariya me jî birîndar e. Ji-yana sirgûnê ji zarokatiya me pir tişt kêmkirin wekî bêwelatiyê, bêazadî, bêdibistan û gelek tiştên din..." *Hevpeyîna Bêrîvan Kayî / RÛPEL - 4*




Zehra Mohammedzadeh

Têkoşîna ku diroka ronî dike *RÛPEL - 2*

Serdestiya hiqûqê û aborî

Aboriya pergala navneteweyî piranî girêdayî bazara serbest e û bazara serbest jî girêdayî serdestiya hiqûqê û pêşveçuyîna demokrasiyê ye. Li gor pîvanên bazara serbest, hiqûqê û demokrasiyê çiqas sazîbûna xwe bi pêş bixin, ewqas derfet ji bo belavkirina dahatê ya biedelat derdikeve holê... *Ramazan Tûng / RÛPEL - 7*



Terka mamostetiye dikin!

Hindekarê Zanîngeha Bingolê Mûrad Varol ku li zanîngehê dersên kirmanckî dide, ragihand ku li Çewlikê mamosteyên kirmanckî dev ji mamostetiya kirmanckî berdane û derbasî mamostetiya branşên cuda bûne... *RÛPEL - 3*

Doman, domaniyî û ameyena jû netew

Cenî, domanî, îtîqatê ciya ciya, zerre civate de kesî ke dûstê îktîdarî de vengê xo kenê berz rastê zorvajiya de tewr pile yenê. Înan ser her hetî ra na şiddet xo misnena. Hetê fizîkî, aborî, hîssan, bi qese û cînsî mordem sero xo misnena, ciwîyayîşê mordem ser o tesîr kena. Zerrê çeyî de, hurendiya kar de, mektev de ya kî teber de, jû reyî ya kî xeylê reyan rastê şiddetî yemê... *Meral Ozel / RÛPEL - 9*

Samî Tan

Kurmê zimankuj *RÛPEL - 5*

Felemez Ulug

Artêşa veşarî *RÛPEL - 7*

Selîm Temo

Hirçê Kezebşewitî *RÛPEL - 8*

Nêz û dûr

Mizgîn Ronak

“Dema mirov ji nêz ve mêze dike, tu kes normal (asan, asayî) nîn e.” Pirtûka Eduardo Galeano ya bi navê “Gotinên Ku Dimeşin” bi vî hevoka Caetano Velasa dest pê dike. Gelo rast e, nêzîktî û nêzîkbûyîn, rastiye diguherîne yan jî rastir dide xuyakirin? Gelo ji bo ku em ji nêz ve mêze nakin, her kesî/ê ‘normal’ dibînin? Lê gelo ‘normal’ çî ye ku ‘normal’ ne normal be, em çiqas ‘normal’ in? Bi rastî jî di nav xirecîr û lez û beza çerxa demê ya ku mirov wekî morîkan li pey xwe dikîşîne, her tişt tevlihev dibe yan jî mirov bêyî ku hay jê hebe kor û ker dibe, sînorên rastî û nerastiye li bin guhên hev dixê.

Ka hema em li vî paşnîvro ya bi ewr bisekinin; li pêşeroj û paşerojê û nihayê binêrin. Lê ew ne bes e. Em ‘ji nêzik ve’ li her tiştî binêrin ne ji dûr ve û fêr bikin ka ‘normal’ e her tişt an na? Lewre ku pirs û pirsyarî nebin em ê di tariye de bifetisin. Tam li vî derê jî nava heman pirtûkê, ev hevok difire tî ser kaxizê: “Dema ku me tevî bersiv dîtin pirs guhertin.”

Gelo ew kî ne yên ku piştî bersivandina me pirsên nû derdixin? Lê dibêjin em zêde li dûr negerin. Lewre jiyana bê pirs û pirsyariyê wekî gardiyaneke qirêj û kor e, loma jî em bi xwe ji xwe re li pirsan digerin û wekî bizmarên zengarî bi hin bersivan re mahekûmbûyî namînin. Ji ber ku her pirs; rê ye, rêwîti û seyran e. Her çiqas ku hin kes bêjin qey ew piştî bersivdîtinê me, pirsên nû wekî Pira Siratê derdixin pêşya me jî ne rast e. Em bi xwe ji pirsan hez dikin û bi pirsan dimeşin, bi qasî bersivan ji pirsan jî hez dikin.

Mînak; di mijara kurd û Kurdistanê de tu bersivê nedayî nemaye, her tişt jî hêla dîrokê ve jî jî hêla roja me ve jî li holê ye. Lê dîsa jî em digerin, pirsên nû dibînin û jî bo bersivên wan dikevin nav govenda kedkariyê. Di mijara tiştên ku jê re ‘mîrin’ û ‘jiyan’ tê gotin de jî em pirsên nû dibînin û bi wan pirsan digihîjin gundê bersivan (ma gundê bersivan heye?). Lê li wî gundî nasekinin û xwe diavêjin bextê rêwîtiyêkê din...

Nexwê em ne ‘normal’ in ne? Ger em ‘normal’bûna me yê li derê bigota bes û xwe teslîmê pergala heyî bikira. Lê na, em didomînin û huzûr jî wan re nahêlin. Loma tevî êrişên wan nabin ‘bersiv’ jî jî pirsên me re, em bi aqilmendiya pirsyariyê deriyên li ser rûyê wan ê pis digirin. Dema deriyên me dişînin û dikevin hundir jî deriyên me wan red dikin û ew, her ku gur in, bîna bêhna redkirina derigirtina me baş digirin dema bi çavên xwe dibînin jî hêç dibin û jî bilî hesin û zirxan nikarin hebûna xwe ya li welatê me bido-minin.

Belê, bayê êvarê ye ku bêhna agirekî jî dûr tîne dibêje; “Ji nêz ve her tişt normal e, gere hûn jî dûr ve mêze bikin?”. Lê nivîskar xwe dixeyidine. Belam em dizanin ku her du jî rastiye dibêjin. Carna ne nêz, ne jî dûr têra dîtîne dike. An jî tiştên kesên ku em wan jî nêz ve nebinin, em ê çawa wan jî dûr ve bibînin û yên ku em wan jî dûr ve nebinin jî nikarin ji nêz ve bibînin û pîrsek din: Nêz çî ye? Dûr çî ye?

Dixwazin jinan bêbîr bihêlin

Ji ber ku ji bo polîtîkayên komkujîyê hemû rê û rêbaz mubah in, zarokên 5 salî jî, jinên ciwan ên 15 salî jî dibin hedefa tacîzkaran

Derya Bawer

Pêvajoya xwe rêxistinîkirinê ya bavksalariyê, bi tunekirin, berovajîkirin û bêqedirîkirina destkeftiyên jinan re pê de çûye. Ya herî girîng jî, hewl dane jiyana ku jin afirînerên wê ne, bi jinan bidin jibîrkirin. Xwestine jinan bêbîr bihêlin.

Xwestine jiyaneke ku jinan nîrx û çanda xwe ji bîr kirine bîafîrînin û jinan di nava vî jiyana “nû” de bêbingeh û bînîrx bikin û bi nîrxên bavksalariyê wan tevî jiyaneke bikin.

Hemû pergalekî di dijî azadiyê tim û daîm, hewl didin, yên ku hêza wan a dînamîk jî wan re xetere ye tune bikin an jî pasîfîze bikin. Her wekî

îro partiya paşverû bi rê û rêbazên herî hesas şerê taybet pêk tîne. Polîtîkaya îktîdarê ya komkujîyê, tiştên ku nekariyê bi rêbazên şer, tundî û zextê pêk bîne, îro dixwaze bi rêbazên qirêj pêk bîne.

Bi hemû kadroyên xwe yê pispor Kurdistan veguherandine laboratuarekê û bi rêbazên xwe yê qirêj bi hemû jiyana xwe seferberî ilan kirine. Bi gotina “Rêbazên me yê ewlehiyê têrê nakin, bi rêbazên nû em ê çareseriyên bibandortir bibînin” desthilatdar îlan kir ku dê biryarên xwe yê di wan laboratuaran de didin, bixin meriyetê.

Bi navê polîtîkayên ewlehiyê her cure wehsetê pêk tînin û dema ku serkeftî nebin jî bi polîtîkayên şerê taybet hewl didin bi bandor bikin û bi vî yekê hewl didin jiyaneke dejenerasyonê dikin polîtîkayê bibandor a komkujîyê û dixwazin di ser jinan re (ku herî zêde nakokî û lêgerîna wan a azadiyê xurt e), civakê pasîfîze bikin. A girîngtir

jî; hewl didin vî yekê di ser jinên ciwan re bikin. Jinên ciwan pêşeroja civakê, veguhêzerên çandê û avakerên jiyana nû ne. Li dijî wan gotina “dar dema ku ter be, divê were tewandin” jî xwe re esas digirin û polîtîkayên herî qirêj li ser wan pêk tînin.

Di salên dawîn de bi milyaran pere ji bo rêzefilman xerc dikin. Dixwazin bi xeyalê senaryoyên wan rêzefilman û heyraniya karakterên wan, ciwanan jî rastiye dîr bixin. Li ser medyaya civakî malperên taybet çêdikin, di wan de lehengên rêzefilman dîlkêş dikin û bi navê hevaltîyê jinên ciwan ber bi wê çiravê ve dikêşin. Li paş her tiştêkî li Kurdistanê, paşxaneya wan polîtîkayane heye.

Di salên dawîn de bi hezaran karmend ji pişeyên cur bi cur li gelek saziyan hatin bicîhkirin. Ma tesaduf e ku ew kesên hatine bicîhkirin, bişîbin kesên hilbijartî yê di wan rêzefilm û filman de? Bi navendên qaşo

perwerdeyê yê ku berê navendên asimilasyonê bûn, kesên bi taybet jî dibistanên polîsan hatine hilbijartin, di zanîngehên li Kurdistanê de bi cih dikin û jî bo ku “peywirên xwe baştir bikin”, jê re prîm tê veqetandin. Ev yek jî bo rêbazên şerê taybet girîng in û pir zêde bale dikêşe ser wan rêbazan. Di serî de bûyera Gulistan Doku, bûyerên xwekuştîna û yê din ên li zanîngehan girêdayî vî yekê ne. Mamosteyên nû, li navendên Kurdistanê yê welarparêziya wan xurt, tîne tayînkirin. Di dibistanên seretayî û lîseyan de, bi bûyerên tacîz û tecawîzê dikevin rojevê û ev yek bi tenê wekî tacîzkariya mîran nîkare were dîtin. Ev yek encama tacîz û tecawîzê wek polîtîkayê şerê taybet bikaranîmê ye. Tacîz û tecawîzê wek çekeke bîbandor li hember gelê kurd bi kar tînin.

Ji ber ku ji bo polîtîkayên komkujîyê hemû rê û rêbaz mubah in, zarokên 5 salî jî, jinên ciwan ên 15 salî jî dibin hedefa tacîzkaran. Ev bûyer di demên dawîn de, di dibistanan de berbelav dibin û ev yek jî girêdayî pêkanîna polîtîkayên pisporên komkujîperest ên desthilatdariyê ye. Desthilatdarî jî bo ku pêşî li destkeftiyên kurdan bigire û jiyana azad a bi pêşengiya wan li Rojhîlata Navîn ava dibe adesteng bike, vî şerî bênavber dimeşîne û bi rêbazên şerê taybet dixwaze berfîrehtir bike. Dixwaze jinan di hemû qadên jiyaneke de pasîfîze bike, şerpeze bike û ber bi lêgerîna jiyaneke ya sexte ve bibe û bi vî yekê wan bîbandor bike. Ev hemû navgînên îdeolojîk ên îktîdara paşverû ne û dijberiya îdeolojiya jina azad in. Li hemberî wê, birêxistinbûn, jiyandîkirina nîrxên azadiyê, di hemû qadên jiyaneke de li dijî rêbazên komkujîyê liberxwedan; dê li dijî komkujîyê bibe bîngeha hebûnê.



Jinên rojhîlatê Kurdistanê di dem û dîrokên cihê de, li dijî dagirkerên axa xwe mil dane milê bav û birayên xwe tîkoşîyane, di van tîkoşînan de bi rola pêşengîyê rabûne. ruxmê êriş, dagirkerî, zîlm û polîtîkayên dewletê yê çewisandinê jî wan tu carî gav paş ve neavêtine, xwe di nav sînorên ku ji wan re hatine diyar kirin de nefetisandin.

Di her qîrnekê (sedsal) de jinên ku mohra xwe li pêvajoyekê dane, derketine pêş. Yek jî wan jinan jî Hatû Şahnaza keça Yeqûbê Erdelanî ye ku bi şerkerî û qehremaniya xwe dihat nasîn.

Di wan deman de bi piranî, kurdan çiyayên asê jî xwe re kiribûn perestgeh û li wan deran cî û war bibûn. Ji xwe heya rêjeyekê xweser bûn. Her çend dem bi dem rastî êrişên desthilatdaran hatibin jî rê nedane ku axa wan ji dest wan biçe. Ji ber taybetmendiya erdnîgarî û axa bi bereket, mirov dikare bibêje rewşa bi şer her tîm mijara gotinê bû. Vê carê jî Loristan hatibû dorpeçkirin. Helo Xan li herêma Bacirhana nêzî Sîne di şer de bû û xebêra giranbûna şer li herêma belav bibû.

Artêşa Îranê ya li Erdelanê, li nêwala Arezê bi cih dibe û ev yek bi xwe re xeteriyekê mezîn tîne. Hatû Şanaz hay li rewşê heye, ji bo wê jî bang li jinên Erdelanî dike û wan vedixwîne meydana cengê. Bi banga Hatû Şanazê 500 şerejîrên kurd dicivin. Hatû Şanaz bixwe rêbertiya vî yekîneya ku ji jinan pêk tê dike. Ew



Zehra Mohammedzadeh

Têkoşîna ku dîrokê ronî dike

ne tenê jî hêla şer de, belku di milê taktîk de jî jêhatî bû. Helbet ev ne cara ewil bû ku jin dest davêrî çekê û şer dikir. Lê wan 500 jinan karîna seyra şer biguherînin. Ew barîna baranê wek fîrsendek baş bikar tînin û jî çar alîyan êrişê leşkerên ‘Sofi’ Kelp Elî Xanê fermandarê îranî dikin, wî li wê derê dikujin.

Di sala 1278’an de, di çaxekê din de jî wê jina bi navê Qedem Xêr rabe û jî bo rizgarkirina axa xwe, dest bi tîkoşînê bike. Jixwe di tevahiya hikûmariya Pehlewiyan de jinên kurd her tîm li dijî êrişan di nav tîkoşînê de bûne. Di wan salan de artêşa Pehlewiyan nû li herêma Loristanê bi cih dibû. Zexteke mezîn li ser gelê xweçihî hebû. Dîsa dagirkeriya hêzên îngilîz û armanca wan a dîlgirtin, helandina gelê herêma mevzûbêhs bû. Di sala 1320’an de, di navbera qebîleya Qedem Xêr û hêzên dagirker de şer destpê dike. Artêşa Rîza Xan êrişê Loristanê dike, lê belê Qedem Xêr ku fermandara hêzên kurd bûye rê nade dagirkeran û nêzî pînc salan tîkoşîneke bêhempa dide meşandin.

Helbet ne tenê li Loristanê belku li gelemperiya erdnîgarîya Kurdis-

tanê tîkoşîna li dijî zîlm û dagirkeriyê hebû. Di dema dewleta Safevî (Îran) de, li Rojhîlat, gundên li herêma Tîrgever, Mîrgever, Bîradost û Şînoyê tîne dagirkirin. Tîkoşîna gel a serxwebûnê her tîm rastî êriş û astengiyên Osmanî û Safeviyan tî. Şah Abbas (1587-1629) dixwaze eşîrên kurdan bixe bin serweriya xwe. Lê gelê kurd vî yekê napejîrîne. Xanê Çengzêrî serî hildide û ev serhildan (1608-1610) wek tehlûkeya herî mezîn a li dijî dewleta Safevî tî hesibandin. Ji bo wê jî dê hişk bi ser keleha Xanê Çengzêrî de bihatana. Guher Xanima diya Xan di vî serhildanê de roleke girîng dilîze.

Her wiha dema ku dibîne keleh dikeve, bi barûdê kelehê bi erdê ve dike yek. Ew ne tenê kelehê, belku rê nade tu kes bikeve destê neyaran. Li gorî gotegotan, di keliyên dawî de ku keleh wê bikeve, ew hemû jinan kom dike, keziyên xwe bi hev ve girê didin û xwe di kelehê de davêjin.

Ew heya keliya dawî tîdikoşin, şerê dikin û dû re jî bo nekevin dest dijîmin tevî zarokên xwe, xwe feda dikin. Tiştên ku vî çîroka berxwedaniya kurd û kela Dimdimê ew çend diyarker dike, qeh-

remanî û tîkoşîna jinên kurd e.

Bêguman çîroka tîkoşîn û berxwedaniya her yek ji wan jinan bûye îlham ji bo tîkoşîna jinên kurd ên rojhîlatê Kurdistanê ku îro jî ruxmê hemû zextên pergala îslamî ya Îranê (ku li dijî biçûktîrîn dijberî û daxwazên azadixwaz serî li rêbazên zext û çewisandinê dide) tîbikoşin û dengê xwe berz bikin. Ev sekna jinên kurd nîşaneyê serberziya jinên kurd e ku tu carî li dijî zaliman serî netewandine. Ev sekna ku rê nedaye teslimiyetê, îro jî li dijî pergala patriark a komara Îslamî (ku jinê bi kuştin û dîlgirtinê ditirsîne) dibe sîrûşt û rêya berxwedanê.

Jinên Rojhîlat îro jî li ser vî rêça berxwedêr dimeşin û jî bo parastina fikir û ramanên xwe jî canên xwe dibin, tîne girtin û kuştin, lê teslîm nabin. Her çend di tîkoşîna serxwebûna kurdan de (ku di dem û dîrokên cûda de hatiye meşandin) zêde behsa rol û çîgirtina jinan nehatiye kirin jî em ji wan mînanan jî pê derdixinin ka jinên kurd xwedî bandor û tîkoşînekê çawa bûne. Di her sê mînanan de jî tiştên jinê digihîne hev berxwedan e, li dijî êrişên serite-wandinê tîkoşin e.

Bîranînên har

— Fatma Taşli

Dinav civatên herî qelebalix de, di nava bîranînên kûr de bi tena sere xwe digevizim. Di nava civatê de tenê me tîm.

Tik û tene.

Bîranîn nahêlin ku tev li jiyana rojane, tev li dost û hevalan bibim.

Gerînekê biranîn, min ji hiş û aqil dibin. Ji ber wan ez û laşê xwe em tîm ne li hev in. Laş û gewde li derekê be biranîn min dibin dereke din. Carnan li çiyayê Mîştênûr dest û lingê egîdê xwe berhev dikim ji çolê, carnan bi cendekan re diqerisim di sarincan de. Carnan di ava sar û seqema zivistanên çetîn de diricifim, diqeflim, carnan bi gliyên xwe ve bi erdê re time kişandin û min davêjin nav sergoyan. Carnan di nava çar diwaran de serî datînim bi dirûşmeyan, bi qêrînan. Carnan tevli zar û zêçan ji ber kotek û lédan û zilma mîrê bêwîjdan xwe li kûçê û kolanan diqelîbînim... Dil di-soje, qirik û gewrî li min zuha dibin û çavên min şil dibin.

Nizanim çî hewala min e. Heme yan tune me. Dijim yan di xewnan de me nizanim.

Agirê nava dilê min, min diqelîne. Gaziya min a tepisandî di hundurê min de serî rakirîye. Vî agirî bi ser kê de birjînim, vî gazyê bi ser kê de birjînim, nizanim.

Ma qey ev denge min yê hundurîn dê qut nebe. Ez ji guhan kirim vî dengî. Wek ku ew ê qet kut nebe li xwe zêde dike û olan dide di nava min de...

Şerêkî dijwar heye di nava mêjiyê min de. Biranînên şerûd bi çekên giran li hev didin. Hevokên ji nav wî şerî diqetin carnan bêhemd tîm ser zimanê min. Carnan hew dibînim ku wek dinan xwe bi xwe dipeyivim.

Diqehêrim, dibetilim, dibehdilim û bi dengê bilind diqirîm carnan, dibêjim; “Ey Xwedêyo, ma gelek zehmet bû ku te di nav ewqas serborîyan de tiştê bikira ku carekê be ji birşîneke biçûk li rûyê min belav bibûya?”

Piştî wan gotinan wek min gunehekî giran kiribe dîsa li ber diqerim, dibêjim; “Hey Xwedê, min efû bike, qet nebe li vî aqilê minî nîvco miqatebe, tenê di destê min de ew maye bila ew ji neçe. Lê bila tu zanibî ku li mahşerê ew ê dozeke min a giran hebe li hember çederê.”

Dû re bi aqilê xwe bi xwe dikenim. Ji xwe ya ku min dikenine tenê aqilê min yê nîvco ye.

Rastiya ku bi erdhejê derket holê!

Bi erdheja Xarpêtê derket holê ku bexşên ji bo mexdûrên bobelatan, ji bo armancên din tîm bikaranîn. Kizilay pereyên jê re tîm bexşkirin, li saziyên nêzî desthilatê belav dike

Qedrî Esen

Di dîroka Tirkiyeyê de gelek erdhej çêbûne. Piraniya wan jî bi pileyên mezin rûdane. Ji ber van erdhejên bi pileyên mezin, bi hezaran mirov jiyana xwe ji dest dane û bi dehhezaran jî mexdûr bûne. Li gel vî raboriya qambax jî, li Tirkiyeyê bergiriyên pêwîst nayên wergirtin. Piraniya mexdûrên erdhejê dibin qurbana wernegirtina bergiriyên.

Herî dawî jî di 24'ê çileyê de li bajarê Xarpêtê yê bakurê Kurdistanê bi pileya 6,8'an erdhejê pêk hat. Navenda erdhejê navçeya Xûxê ya Xarpêtê bû. Pileya erdhejê pileya herî bilind a salên dawîn bû. Ji ber bilindbûna pileyê, erdhej li piraniya bajarên bakur, rojava û başûrê Kurdistanê hat hîskirin.

Serî li propagandayê dan

Erdhejê bandoreke mezin li bajarên Xarpêt û Meletiyê kir. Ji ber erdhejê bi sedan avahî li gund û navçeyên her du bajarên hilweşiyayan. Li gorî daneyên fermî yê rayerdarên Tirkiyeyê, di erdheja li Xarpêt û Meletiyê de 41 kesan jiyana xwe ji dest da û zêdetirî hezar kesî jî bi-

rîndar bûn. Her wiha dîsa 187 kes jî zindî ji bin kavilan hatin derxistin.

Li her du bajarên jî bilî avahiyan hilweşiyayan, xesar gihişt bi hezaran avahiyan ku êdî mirov nikarin di wan de bijîn. Ji ber vî yekê niha bi hezaran kes jiyana xwe di konan de didomînin.

Weke gelek bobelatên ku li welat diqewimîn, di vî bobelatê de jî desthilata AKP'ê ezmûneke baş neda. Ji keliyên destpêkê yê erdhejê ve wezîrên AKP'ê serî li propagandayên kirêt dan. Bi vî awayî xwestin ku ser rastiya erdhejê bigirin. Dîsa serokkomarê tirk Recep Tayyip Erdogan dema çû Xarpêtê, şûna ku birînenê mexdûrên erdhejê bikewîne, siyaset kir.

Rewş berovajî kirin

Li gel ku rewş li Xarpêtê kam-bax bû û gelek pêwîstî bi alikariyê hebû ji Erdogan rewş berovajî kir. Bergiriyên kêm ên ji bo erdhejê serkeftî nişan da û destûr neda ku ji qada navneteweyî jî bo mexdûrên erdhejê alikarî bê kirin. Dîsa ke-seke ku di bin kavilan de mabû, ji bo propagandayê, kê-

liya ku Erdogan çû ser kavilan jî binî kavilan hat derxistin.

Li gel berovajîkirin û astengiyayan jî, ji bo mexdûrên erdhejê gelek alikarî hat kirin. Lê ji ber ku alikariyên hatin kirin, negihîştin mexdûrên erdhejê, gelek nîqaş jî qewimîn. Gelek kesên ku ji bo mexdûran, ji saziyên dewletê yê eleqedar re alikarî şandin, xwestin ku alikariya wan bigihêje mexdûran.

Kizilay alikariyan didize

Piştî erdhejê, derket holê ku bexşên ji bo mexdûrên bobelatan jî saziyên dewletê re tîm kirin, ji bo armancên din tîm bikaranîn. Weke mînak, Kizilaya Tirk pereyên ku jê re hatine bexşandin, li şûna mexdûrên bobelatan, li sazi û dezgehên nêzî AKP'ê belav kirine.

Piştî erdhejê çend saetan şûnde Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) jî şandeyek ava kir û ji bo lêkolînan şand herêma erdhejê. Şandeya HDP'ê çû gelek gundên herêma erdhejê û tespît kir ku serokên AKPê, alikariyên tîm şandin, li xiz-mên xwe belav dikin.

Walî alikarî asteng kir

Piştî van tespîten şandeya HDP'ê, waliyê Xarpêtê ket nav hewldaneke balkêş. Walî, li

keyayên gundên ku heyeta HDP'ê çûbû geriya û ew hişyar kirin ku ji bilî alikariya Saziya Bobeletê ya Tirkiyeyê (AFAD) tu alikariyê qebûl nekin.

Heman walî, 2 qamyon alikariya ku Şaredariya Erxeniyê ya HDP'ê şand Xarpêtê asteng kir. Walî destûr neda ku alikariya şaredariyê bigihêje mexdûrên erdhejê û ew paşve şand.

Li aliyê din, di derheqê gelek kesên ku li ser medyaya civakî politikayên AKP'ê rexne kirin de, lêpirsîn dan destpêkirin.

Lêkolîna erdhejê red kirin

HDP û CHP'ê pêşniyara avakirina komîsyonê da meclîsê. Her du partiyên xwest ku komîsyona lêkolînê bê avakirin da ku derbarê erdhejê de xebatan bike. Lê ev daxwaza avakirina komîsyona jî bo lêkolîna erdhejê, ji aliyê parlamenterên AKP û MHP'ê hat redkirin.



Mamosteyên kirmancî derbasî mamostetiya bransên din dibin

Navenda Nûçeyan

Li Tirkiyeyê bi milyonan kurd dijîn û her roj karê wan dikeve saziyên dewletê. Li gel vî gelheyê jî di hêla fermiyetê de zimanê kurdan tune tê hesibandin. Li tu saziyên dewletê zimanê kurdî xizmet nayê dayîn. Ji ber vî yekê bi taybetî li bajarên kurdan lê li seranserê Tirkiyeyê di xizmetdayîna de pirsgrêk çidibin. Kurd nikarin tam xwe îfade bikin û xizmeteke bi qalîte nagirin.

Di rojên dawîn de ji bo derbaskirina vî pirsgrêkê li ser medyaya civakî kampanya hat destpêkirin. Bi milyonan kurd piştigirî dan vî kampanyayê. Beşdarên kampanyayê di parvekirinên xwe de rexne li politikayên dewletê yê li dijî zimanê kurdî kirin. Di van rojên ku zimanê kurdî ketiye rojevê de derket holê ku li

Çewlikê mamosteyên kirmancî yê dersên bijarte, dev ji mamostetiya kirmancî ber didin û derbasî mamostetiya bransên din dibin.

Terka mamostetiya dikan!

Hindekarê Zanîngeha Bingolê Mûrad Varol ku li zanîngehê dersên kirmancî dide, li ser hesabê xwe yê twitterê ragihand ku li Çewlikê mamosteyên kirmancî dev ji mamostetiya kirmancî berdane û derbasî mamostetiya bransên cuda bûne. Twitta Varol a têkildarî mijarê wiha ye: “Têkildarî guhertina brans/beşê ya mamosteyên kirmancî êşeke ku demê dirêj e me diêşîne heye. Hin mamosteyên kirmancî, dev ji mamostetiya kirmancî berdidin û di beşeke din de mamostetiya didomînin.”

Hejmara mamosteyan kêm bûye

Têkildarî mijarê li Hindekar

Mûrad Varol geriyam û min mijar rasterast jê pirsî. Varol, bi lêv kir ku sala borî 12 mamosteyên kirmancî li Çewlikê peywir kirine, lê ji ber derbasbûna wan a bransên cuda hejmara mamosteyan kêm bûye û ev tişt got: “Ev yek bandorê li tercihekirina xwendekaran a darsa bijarte ya kirmancî jî dike. Her wiha ji ber ku mamoste dev


ji mamostetiya kirmancî berdidin, jî dibistanan re hincet peyda dibe. Dibistan radigihînin ku ji ber mamosteyên wan ên kirmancî tunene nikarin, darsa bijarte ya kirmancî bidin.”

Eleqeya ji bo kirmancî baş e

Di berdewamê de Varol, anî ziman ku ji ber terikandina mamos-

teyan, xwendekarên beşa kirmancî yê zanîngehê jî bi zorê motive dikin û wiha pêde çû: “Xwendekar jî me re dibêjin ku heke mamosteyên kirmancî derbasî mamostetiyeke din dibin, çima em vî beşê dixwînin. Ji ber vî yekê em jî zehmetî dikîşînin.” Varol, got ku li Çewlikê eleqeya ji bo dersên bijarte yê kirmancî baş e û ew dixwazin vî eleqeyê zêdetir bikin.

Di dawiya axaftina xwe de Varol, destnîşan kir ku tenê têkildarî Çewlikê agahî li ber destê wî hene û ev tişt anîn ziman: “Dibe ku ev rewş li bajarên din jî hebe. Dibe ku li hin bajarên din jî mamosteyên kirmancî derbasî mamostetiya beşeke din bûbin. Heta dibe ku ne tenê mamosteyên kirmancî, mamosteyên kurmançî jî terka mamostetiya xwe kiribin û derbasî mamostetiya bransên cuda bibin.”



STRANBÊJÎ TIŞTEK XWEZAYÎ YE Û WEK GULEKÊ ŞÎN DIBE

Dengbêjî derman e

→ Bêrivan Kayi

Jiyana sirgûnê ji zarokatiya me pir tişt kêm kirin wekî bêwelatiyê; bê azadî, bê dibistan û gelek tiştên din gelek bandor li ser me kiriye. Kurdên sirgûnê ev 100 sal in ji welatê xwe dûr in. Li gorî min kurdên Sovyetê dane nîşandan ku xwedî welatparêziyek bê hempa ne. Ev serkeftina mezin a mezinên me ye

Di nav kurdên ku di navbera salên 1937-1945'an de sirgûn bûne de malbata hêye ku sed sal berê ji navçeya Bazîdê ya Agiriyê koçî Ermenistanê, ji wir ji koçî Asyaya Navîn bûne. Piştî hilweşîna Sovyetê, di sala 1993'yan de ev malbat rastî sirgûneke din tê û vê carê jî derbasî Saratovê (Rûsya) dibe. Belê em qala malbata stranbêja kurd Tara Mamedovayê dikin. Li hemberî zor û zahmetiyên sirgûnkirinê çawa ku dayika wê Gorçek Abdulayevna li Kirgizistanê Komeleya Çanda Kurda a Elegezê ava dike. Tara Mamedova jî bi stranbêjiya xwe çand û zimanê xwe yê kurdewar diparêze.

Ji bo xwendevanên rojnameya Xwebûnê em Tara Mamedovayê ji nêz ve nas bikin.

Tara Mamedova bi çi hestê dest bi stranbêjiyê dike? Dikarî hinek behsa çiroka xwe ya hunermendiyê bikî?

Ez bawer im, ez bi stranbêjiyê ango hunerê re ji dayikê bûme. Nayê bira min, min kengî dest pê kiriye. Min dîtîye nedîtîye ez kilaman dibêjim, dans dikim û tim li ser dikê me. Ev tişt an di xwezaya mirov de heye an jî tune ye, wek gelek tiştên din.

Min li dibistanê dika profesîonal nas kir, ez 7 salî bûm û ji wir heya niha li ser dikê me.

Wekî tê zanîn, armanca sirgûnê dûrxistina ji çand, ziman, welatê ango ji xwebûnê ye. Ev yek jî travmayên kesayeti û civakî bi xwe re tine.

Gelo li diasporaya Kafkasayê malbata te çand û zimanê xwe çawa parastîne?

Rast e armanca sirgûnê dûrxistina ji çand, welat, ziman û xwebûnê ye. Lê belê ev armanca heya niha ji bo kurdên Sovyeta Kevin negihîstîye çihê xwe. Kurdên Sovyeta Kevin gelek êş, keder û xerîbî dîtî. Ên ku baş nizanin hew dizanin ku di nav xweşî û aramiyê de jiyane lê ne wisa ye. Tu car li çihê ku jiyane wek hemwelatî nehatine qebûlkirin, tim û dayim hatine biçûkkirin û hatine eşandin lê ziman û çand jî nehatine qedexekirin. Ev xal bû sedem ku kurd di nav xwe de bijîn û neyên asîmîlekirin. Urf û edetên kurdan heya roja îro wek berê ne, xwe parastine û tirsîyane ji hev belav bibin. Ez bawer im ew tirs di çihê de ye. Vê tirsê hişt ku çand û ziman were parastin. Lê van salên dawî ez li wir pir kêm be jî hêdî hêdî ji xwe dûrketinekê dibînim, bi taybetî di hêla zimanê de.

Kurdên sirgûnê ev 100 sal in ji welatê xwe dûr in. Li gorî min kurdên Sovyetê dane nîşandan ku xwedî welatparêziyek bê hempa ne. Ev serkeftina mezin a mezinên me ye.

Tu bi xwe jî heta 9 saliya xwe li Kirgizistanê dijî, gelo bandora sirgûniyê li ser stranbêjiya te heye?

Her kurdekî/e sirgûnê gelek êş kişandine û tişt a ku li sirgûnê dilê me hindik be jî rehet kiriye, dengbêjî ye. Dengbêjî li gorî min derman e û her mirovê/a ku xwe pê derman dike bextewar e. Ez dibêjim bextewarî lê bextewariya me jî birîndar e. Jiyana sirgûnê ji zarokatiya me pir tişt kêm kirin wekî bêwelatiyê, bê azadî, bê dibistan û gelek tiştên din. Ger em di vê zanebûnê



de bin an nebin; vê yekê gelek bandor li ser her yekî/ê ji me kiriye û helbet li ser min jî kiriye.

Xala din jî li gorî min stranbêjî tiştêk xwezayî ye. Dema ku ev hest di mirov de hebe jixwe pişt re wek gulekê şîn dibe û diherike. Ez dibêjim qey ez jixwe wek stranbêjekê jî dayik bûme. Ji ber vê hezkirina hunerê min xwe pir bi şens dihesiband. Ji ber vê jî di nav malbatê de ez zaroka herî bextewar bûm. Di wexta Sovyeta Kevin de kurdên sirgûnê jixwe gelek rê li ber hunerê vekiribûn û min xwe sparte vê çanda hunerê. Bandora dayika min jî li ser min gelek bû, ji ber ku ew jinek hunermend û dengxweş bû. Min ji heybeta dayika xwe pir hez dikir. Min ew dişopand û hê jî dişopinim.

Di qadên mîna wêje, felsefe û hunerê de ango em dikarin bêjin ku di qadên jiyana hemûyan de mîr bi hişmendîya xwe ya serdest tim xwestîye rê li ber jinan bigire. Wek jinekê astengiyên di qada muzîkê de derdikevin pêşiya te çi ne?

Ne tenê jina kurd li tevahiya cihanê îro her jinek ji serdestiya mêran û awayê wan zilm dîtîye û hê jî dibîne. Mixabin li hinek welatan zêdetir û li hin welatan kêmtir be jî li her derê mejiyê serdestiyê heye. Min wek qîza bavekî, xwişka birayan, xwarziya xalan û biraziya apan, wek qîza kurd wek jinek gelek zorahî û zehmetî kişandine. Naxêr astengiyên li pêş min derkevin ez bimrim jî xelas nabim. Lê min şerekî bê hempa kir û ez ne ew kes bûm ku di bin bandora serdestiya bav û birayan de bijim. Her wiha ez qîza jineke şervan bûm. Dayika min rêbera min bû ku wek çirayê pêşiya jiyana min ronî dikir.

Lê xala ku zêdetir min diêşîne ev e; êdî jin jî ketine nav vî karî. Fikra hişmendîya wan mîrên serdest gelek jin ji şibandine xwe û êdî jin jî li jinê dixê. Serdestî û zilma ku mêran li jinan kiriye û dike min pir diêşîne lê ya ku jin li hev dikin min dikuje. Hewce ye em zanibin ku rêya serbilindiyê bi xwe-bawerî, pêşveçûn û hezkirinê pêkan e. Beriya her tiştî divê ku jin ji birîna jinekê fêhm bike hez bike û rê lê veke. Ne tenê jin her mirovekê divê ji kûrahiya dilê xwe fêrî hesta hezkirinê bibe.

Li aliyê ku tu bi stranbêjî Yasmîn Levy re, li aliyê din jî bi stranbêja kurda êzîdî Zara Pashaevna Mgoyan re, hûn projeyan amade dikin. Ligel

vê, te bi Tara Jaffê re jî stran gotibû. Gelo em dikarin van xebatên te wek hêzeke hunermendiyê ya jinan bi nav bikin?

Yasmîn Levy, Zara, Tara Jaff bo min jinên bi hêz in. Ew hêza xwe ji heskirinê, ji melodî û stranên werdigirin, loma jî bo min pir girîng in. Her sê jî hevalên min in êdî û ez pir şa me ku jinên wiha di jiyana min de hene û ez pir tiştan ji wan fêr bûm, fêr dibim.

Beriya sê salan min û Zarayê me hevûdu nas kir. Deh sal berê hevala min Aza Evdalî ya ku li cem min xwedî cihêkî cuda ye, hate Parisê. Wê pir dixwest ku Zara bi kurdî kilaman bêje. Li ser vê daxwazê jî li Enstîtûya Kurdî me hevûdu nas kir. Ji min re got Tara tu nikarî ji Zarayê re kilaman binivîsî? Min wê çaxê got na. Ji ber ku min xwe wek nivîskareke kilaman nedidît û min got pir zû ye. Piştî 10 salan di Aza Evdalî telefon kir, diviyabû ku ji bo Zarayê min kilam binivîsîya û min nivîsî û pir pê bextewar bûm. Ez, Yasmîn û Zara jî salekê zêdetir xebitîn ji bo wan her sê kilaman û heya niha jî dixebitin.

Cihê Tara Jaffê li cem min taybet e. Ji bo TV'ên kurdî cara yekem min bi wê re kilam gotin. Tara Jaff bû keştiya ku ez derbasî wî aliyê çem kirim. Ew muzîkjen, jin û dayikekê bê hempa ye.

Ev xebat helbet tîne wateya hêza jinan a ku jin bixwazin dikarin bi hev re gelek tiştên mezin bikin û bi ser bixin. Hêvîdar im, em jin em ê karibin hezkirinê wek gulekê di nav cihanê de biçîkinin.

Awayê muzîka te wek blues cazzê û cazza etnikî te binavkirin. Di navbera hestên muzîka Êrivanê û blues cazê de têkiliyek heye gelo? Bi ya te, di blues cazzê de mirov dikare êş, kêfxweşî û hestên kurdan hîs bike?

Ez muzîka xwe wek Blues Cazzê bi nav nakim ev xal tim şaş hatiye fêmkirin. Ez bi klasîkên kurdî û klasîkên rûsî mezin bûm û li Fransayê jî li ser muzîka cazzê min perwerde dît. Muzîka min etnik e lê di dengê xwe de ez motifên cazz û ramansê bi kar tinim, loma dibe tarzekê cuda; carna world muzîk carna jî experimental e.

Her civakek li gorî erdnîgariya ku tê de dijî, bûye xwedî çandêke li gorî wê erdnîgariyê reng jî deng jî cudan e û jixwe bedewî jî wê cudatîyê tê. Em kurd jî xwedî rengên xwe ne. Lê em hemû mirov in û xwedî hest û mejî ne. Loma gava em muzîka afrikîyan dibî-

hîzin, dikarin li ber dans bikin an jî govendê bigirin. Ew hinekî jî girêdayî fîrehbûna hestên me bi xwe ye. Mirovek ku pir geriyabe, ji muzîkên gelek civakan hez dike û nêzîkî xwe dibîne, yê/a ku negeriyabe xwarinekê din nexwaribe dibe ku zehmetir be bo wî/ê, ev normal e.

Muzîka kurdî ji dengbêjiyê tê û kilamên govendê ew tarzekê pir cuda û orijînal e, her kurdekê xwe di nav de dibîne û heya tayênerîyê xwe hîs dike.

Lê nayê wê wateyê ku em nikarin bi tarzên din muzîkê çebikin û nûjen bikin.

Carna hinek mirov, kesên ku bi awayekê din muzîkê bi kurdî diafirînin rexne dikin û dibêjin we muzîka kurdî xera kiriye. Muzîk tiştêk bêşînor e û jî dil û laşê mirov bê hemdê xwe derdikeve, tu kes nikare şînoran jê re deyne... Lê heqê herkesî heye xwe tê de bibîne an nebîne hez bike an hez neke.

Roja me ya îro jixwe xuliqandin pir zor e, gelek hunermend li ser nakaratan dixebitin ji ber ku herî zêde di kilamêkê de nakarat tîne guhdarîkirin. Êdî her tişt bo qezenkîna pereyan tê çêkirin. Gava muzîk çêdibe hemû kes li gorî tikandinê youtubê diafirîne. Ev mirov dişewitîne û li gorî wê em hemû xetayan dikin.

Lê ez gelek caran risk be jî, tiştê ku jî dilê min tê dikim. Ez bi sê çand û sê zimanan mezin bûm û vîya dikîşînim nav hunera xwe. Ev normal e ku carinan kurd di nav de xwe dibînin carinan jî nabînin... Lê ez kurd im û ez ê tim heya mirinê bi zimanê xwe kilaman bêjim.

Roja me ya îro êdî muzîka kurdî li cihanê jî tê nasîn. Tu rewşa heyî ya asta muzîka kurdî û hunermendên wê çawa dinirxîni?

Di cihanê de gelek hunermendên kurd hene ku xwedî hêzeke bê hempa ne lê gelek jî wan wek kurd nayên nasîn mixabin.

Kurd jî tu kesî kêmtir nîn in û di hemû waran de jî gelek serkeftî ne. Lê ya ku nahêle hinek şînor bîne qetandinê bêwelatbûnê e. Heke kurd xwedî statuyekê bûna dibû ku navên hunermendên kurd cihanê zêdetir bi-hejandana.

Disa jî huner tiştêk pir taybet e ku mirov bixwaze di her derfetê de dikare biafirîne. Divê ku em di nav xwe de jî, ji xwe re astengîyan çenekin. Ez pir bawer im ku wê hunermendên kurd bigihên gelek astên baş di nav cihanê de. Bala min gelek dikîşîne di nav kurdan de ên ku rock, jazz, opera, rap, funk û yê din diafirînin zêde bûne û guhdarvan jî zêde bûne. Ev ne tiştêk xirab e, divê ku di nav kurdan de jî awa û rengên her muzîkê hebin. A girîng bi kurdî be.

Rojnameya Xwebûnê nû dest bi weşana xwe ya heftane kir, ji bo xwendevanên Xwebûnê hûn dixwazin çi bêjin?

Ez rojnameya Xwebûnê pîroz dikim. Kêfa min gelek jî navê wê re hat. Bila em wek xwe hebin û wek xwe bijîn tim û daîm. Hêvîdar im rojnameyên me jî hunermendên me jî roj bi roj mezin û zêde bibin.

Ji bo hevpeyvînê em spas dikin.

TARA MAMEDOVA kî ye?



Stranbêja kurd Tara Mamedova, bi şeweya caz û popê stranên xwe dibêje. Mamedova di sala 1983'an de li gundekî biçûk ê Kirgizistanê li sirgûnê hatiye dinyayê. Çiroka malbata wê ya sirgûnkirinê ji Bazîdê ya Agiriyê dest pê dike û heta Kirgizistan û Rûsyayê didome.

Êşa zimanê kurdî²

Kurdên ku bajar xerîb û biyanî didîtin li wan ferz bû ku di dorhêla vê bênderê de jîyan û hebûna xwe ji nû ve ava bikin. Dest avêtine çî bi tirkî bû, berê xwe dane ku derê bi tirkî û têkiliyên bi tirkî re rû bi rû man

Yaşar Eroglu

Ji bo ku zimanê gundewar baş bê fêmkirin me gelek taybetiyên vî zimanî diyar kirin. Baş tê gihîştin ku dortengiya têkiliyên zimanê gundewar lê ferz dike ku ziman berê xwe bide fêmdarî û ragihandina rihet û hêsan. Sembol, şibandin, jihevzêdekirina peyv û navan berê ziman dide şênberiyê. Ji bo gundiyan dibêjin, 'bi çavên xwe nebînin bawer nakin.' Ev rastiyeke bêniqas e. Ramandin û têgihîştina razber ji bo gundiyan zehmet e, ji ber ku mêjî hînî sembol û hêmayan bûye. Eger bi sedan salan heman teşe di jîyanê de dewam bike, ziman xwe nû nake, heman sembol û hêma dewam dikin, her tim di heman çerxa teng de dizivire. Derfetên fikir û ramanên nû çênabî. Zimanê razber bi pêş nakeve. Fikirandina gundewariyê zêdetir teşeya mîtolojîk e. Di nav civakê de efsane û gotegot pir berfireh in. Ji aliyê fikir û raman ve dikare bê gotin ku civak di serdema vîrtîtiyê de ye. Ev tam rastiya me kurdan radixe ber çavan. Efsane, destan û çirokên me weke behrekê ne lê belê çîqaş biyanî hatine, kurd pir bi rihetî bi wan xapiyane. Fikireke wan a pêşerojê bibîne û dekûdolabên biyanîyan pûç bike tune bûye. Bi çîrok û çanda zargotinê - dengbêjiyê heta sedsala bîstan hatine. Ev jî ji bo amajekirina asta ramandina zimanê gundewar xaleke girîng e.

Peyvên ku me ji wan gotibû koka sembolên ziman in û ziman xwe pê girtiye, pirdengî - du-sêkîteyî pê afirandiye, pileya ragihandinê dewlemendtir kiriye. Ev rastî tiştêkî din jî dide xuyakirin, zimanê kurdî, zimanekî xwecih e, li ser warê xwe lê ewiriyê yekkîteyî pêk aniye. Yanî koka zimanê kurdî xwe digihîne serdema yekkîteyiyê û zimanekî gelek kevnar e.

Gotina zimanê gundewar ne qusû û ne jî kêmasiyek e. Ev rastiyeke e, diyarde û desnişankirin e. Her çîqaş venegehezî de zimanê nivîskî û nebûbe zimanê razber jî zimanê gundewar di nav dortengiye de dewlemendiyê mezîna afirandiye. Di dorhêla berhîlîna civakê de kîbî bi kîbî her tişt bi nav kirîye, pir detayên ziman pêk hatine. Mirin û zayîna her canberekî bi navêkî navandiye, mirov û sewal weke hev nedîtinê, dereceya wan jî hev veqetandiye. Ji bo mirovan mirin, ji bo dewar û pez mirarbûn, ji bo se, pisîk û keran hişbûn, ji bo hespan banzdan; ji bo mirovan jidayikbûn, ji bo dewar, pez zayîn, ji bo seyana terikîn, ji bo pisîkan teliqîn guncav dîtiye. Tenê di navbera mirovan de na, di nav sewalan de jî dereceyêk daniye. Dîsa pez pir bi detayan ve bi nav kirîye. Nêr pez; berx, kavir, hoçeç, beran; mê, berx, kavir, berindir, mistewr, mî; kar, gîsk, nêrî, bizin navê dereceya gihîştina wan e. Dewar nêr; golik, kendik, mozik, canega, ga; mê; golik, kendik, nogin, çekek, hesp; cenî, kurîk, mehîn, hesp navê dereceya gihîştina wan e. Bi hezaran navên wiha hene. Em derbasî lêkeran bibin. Ji bo axaftinê tenê di



kurmançî de axaftin, peyvîn, xeberdan, hizîrîn, şitexlîn, qezîkirin, gilîkirin (kurdên Qafkasê), şorkirin, qisekirinê bi kar tinin. Ji bo guherandinê, guhertin, guhestin, veguhestin, veguherandin... gelek nav, lêker û peyvên bi vî awayî hene ku di nav dortengiya zimanê gundewar de dewlemendiyêk xweser radixin ber çavan.

Koçberî, bajar, pêdiviyên nû

Kurdan bi dînamîkên xwe yên navxweyî bajar ava nekirine. Bi awayekî gelemperî kurdan bajar xerîb û biyanî dîtin. Bajar di her serdemê de navendên serdestiya dewletên serwer bûne. Ji bo vî mebestê burokrasî, artêş, hêzên ewlekarî û aboriyê li bajaran bi cih kirine. Heta salên heftê - heştêyan kêmbûna serjimara bajarên Kurdistanê yekser bi vî rastiye ve girêdayî ye. Kurdan xwe li bajaran negirtiye. Serê pêşîn jî ber şertên aborî; makîne û amûrên teknîkî jîyana gundewar guherî, heta ser û bin bû. Gundîtî leqiya û bişkiwî. Koçberiyê ber bi bajarên navendên nêzik û metropolên Tirkiyeyê leqberpê kir. Ji aliyê din ve valakirina gundan bi destê zorê bajar dagirtin. Bi mebesta asimilasyonê seferberiya perwerdeyê gund bi bajaran re kirin yek. Bajar ji nişkê ve mezîna bûn, gund çilmisîn. Helbet ev jî zêdetir bi encama dînamîkên derve pêk hat. Jiyana gundewar ser û bin bû. Çand û jiyana gundan veguherî jî berêya xwe dûrtir jiyaneke nû. Serûbinbûna jiyana gundewar, serûbinbûna jîyan û çanda kurdan e.

Şertên veguhestî di bajaran de dînamîkên nû, jiyaneke nû, hewcedariyên nû, têkiliyên nû bi xwe re saz kirin. Kurdên ku bajar xerîb û biyanî didîtin lê ferz bû ku di dorhêla vê bênderê de jîyan û hebûna xwe ji nû ve ava bikin. Dest avêtine çî bi tirkî bû, berê xwe dane ku derê bi tirkî û têkiliyên bi tirkî re rû bi rû man. Çeperên bi kurdî yek bi yek paşde man, vî lêhiya nerm her roj hinekî zêdetir jîyan jî kurdî şûst. Têkiliyên lê ferz e ku her roj rû bi rû bimînin şaredarî, burokrasî; tapî, nîfûs, poste, dadgeh, ewlekarî, nexweşxane, saziyên ziretê, qadên perwerdeyê; pêşdibistan, dibistanên sereta, navîn û lîse, pêdiviyên sîvil; fature,

GSM, eczexane, markêten mezin, firoşgehên kelmel û amûrên navmal û yên din... Para kurdî dimîne tenê borsayên pez, dewar û mirîşkên ji gundan tî, di nav malê de dê û bav, zarokên temenmezî.

Qulibîna ji gundan, ketina berbayê bajaran bi xwe re xetereyêkê pir mezîna derxistiye pêş; kompleksa xwepeçûkdîtinê. Duh dewletê jî kurdan re digot kurdên biboçîk, kiro, hov û hwd. Îro mêjiyê kurdan bi vî haveyn girtiye û xwemalî bûye. Ev rewş asimilasyonê çand û jîyanê ya xwemalîbûyî ye. Ev berî her tiştî dejenerabûna civakê ya pîskolojîk e. Di bajaran de, kurd di rewitiya bi wesayîten siware de, bi giranî kurdî naaxivin. Ji cil û bergên kurdî dûr in, ji kurdiya xwe fedî dikin. Kurdî piçûk dibînin, ji xwe û hebûna xwe direvin ku pê neyên nasandin. Li pêş wan tirkî û çanda wê heye, berê xwe didin wê. Dema ku kurd hatine piçûkxistin di heman demê de tirkî û tirkî jî hatiye berz û bilindkirin. Vê yekê jî haveynê xwe girtiye. Êdî malbatên kurd nemaze jî dayîk nahêlin zarokên wan di nav malê de kurdî bixivîn û hîn bibin. Dibêjin, bila zimanê zarokên me kêr nemîne, kifş nebe ku kurd in, ji pêşketina wan re nebe asteng.

Êşa zimanê kurdî

Ev rastiyeke me derpêş kirin, ji bo veguherîna kurdan a li bajaran, tenê ne bûyerên qewimandî ne, êdî her yek diyarde û zemîna êşa zimanê kurdî ye ku her roj pê dihele û difetise. Eger ji ber jiyana aborî, eger ji ber zext û zorê û ji nişkê ve êdî jiyaneke kurdan a li bajaran heye. Îro hejmara mirovên li bajaran jî yên li gundan pir zêdetir e. Êdî rastiyeke me ye ku em nikarin jê bîrînin. Vê yekê pîrsgirêk û xetereyên li pêş ziman jî bi xwe re anîne. Tiştên ku di çand û jiyana rojane de derketine pêş di heman demê de bûne êşa zimanê kurdî.

Bajar, kurdan di her warî de diguherîne. Xerîbî û biyanîti kurdan di nav xwe de dihelîne, dihele. Tenê şertên asayî derbas nabin, şidet, mecburiyeta qanûnî, piçûkxistin û şideta spî bi hev re li ser kurdan tîna qewimandin. Li hem-

ber vî spartîne kurd li bajêr tazî ne, bê parastin in. Pêçiriya (qabiliyet) wan a bibê bergînda (muqabil) rewşa nû nîn e. Bêparastîni lê ferz dike ku ew li gorî şert û mercên nû biguherin. Eger li bajaran serwerî di destê kurdan de bûya wê dîsa biguheriya. Lê belê wê li ser koka çand û daneheva xwe biguheriya. Lihevkerîna xwîni nediqewimî. Çand û ziman wê li gorî pêdiviyên nû biguheriya. Lê serdestiya biyanî tenê dirûvê jîyanê na, ruhê jîyanê, kesayet û qerekerê jîyanê jî diguherîne.

Erê ev zemîna e ku rebenê zimanê kurdî tê de avjeniyê dike. Ya rast her roj, her deqe, her saniye ber bi quncikê tarî ve tê ajotin, dor lê teng dibe, destêkî qetrehm qirikê diguvehê.

Zimanê bajaran ê bîgehîna zimanê nivîskî ye. Zimanê bajaran zimanê biyanî ye û yê dewleta serdest e. Zimanê fermî, yê bazarê, yê dibistanan, yê ragihandinê zimanê biyanî ye. Têkiliyên pê çêdîbin dirûvekî nû dide jiyana kurdan û zimanê kurdî pasîvîze dike, her roj dorpêç û bê nefes dihêle. Tenê qadên axaftinê teng nake her wiha kîmyaya zimanê kurdî jî xira dike. Mêjî û pîskolojiyê li gorî tirkî her diçe bandora xwe zêde dike. Rewşa tê behskirin nemaze di qada perwerdeya rêxistinîkî yanî dibistanan de li pêş e. Perwerde mêjiyêkî tirkî diafirîne, ziman û çanda kurdî pêşî pasîvîze dike, paşê pê der pê pûç dike. Dema xwendekar li kurdî vedigere li gorî hevoksaziya tirkî bi zimanekî hîbrîd-melez diaxive. Di dewsa peyvên kurdî de peyvên tirkî bi cih dike. Ji ber ku êdî jî kurdî dûr ketiye, kurdî jê re xerîb tê. Çawa ku çil-pêncî sal berê di gundan de dihatê serê tirkî niha di bajaran de tê serê kurdî. Ji ber ku seranserê demê rewş wiha diqulibe zarok û ciwanên kurd, êdî kurdî jî bîr dikin, dibin xerîbê zimanê xwe. Pê re dibêje, 'ez fêm dikim lê nikarim biaxivim.' Ev rastî xetereyêkê mezîna e ku li ber pêşeroja zimanê me ye: nîfşên nû jî kurdî dûr dikevin û naaxivin.

Ev zemîna ku me diyar kir piştperde û zemîna madî yê êş û xetereya zimanê kurdî ye. Li ser vî zemîne gelek hêma hene ku êşa zimên kûr dikin... (didome)

Ziman û Raman

Samî Tan



Kurmê zimankuj

"Ji demeke ku nayê zanîn ve, zimanên xwecihî li seranserê Girava Kûsî (ev parzemîn niha wekî Bakurê Amerikayê dibê binavkirin) belav bûne. Berî zêdetirî 500 salî, biyanî jî cîbên dîr gihîştin vî derê û bi xwe ra zimanê xwe anîn. Di nav gelek bûyerên kavişker ên mîna qirkirin, metîngerî, emperyalîzma zimanî, nexweşiyên nû û bicihkirina bi darê zorê ra ku pergala aborî, civakî û siyasî ya resen xera dikir, rêbazên karîgerî ên mîna li hemû dibistanan ku zarokên xwecihî lê dixwendin bicihkirina bi darê zorê ya zimanê îngilîzî, zimanên resen ên gelên xwecihî her roj ji roja din kêmtir hatin bikaranîn, gelek zimanan hebûna xwe ji dest da. Li gorî texmînan berî ku biyanî werin li Kanadayê 450 ziman û zaravayên aborjînal ên ji 11 malbatên zimanî hebûn. Bi tenê di nava sed salî da berî kêr 10 zimanên aborjînal jî holê rabûn. Nîba (2008) bi tenê li holê 60 zimanên xwecihî yê jî 11 malbatên zimanî li Kanadayê mane. Nîba tê hevîtkirin ku ji van tenê sê heb jî ber nîfûsa xêde ya axêverên xwe hebûna xwe bidomînin û bi pêş bikevin. Lê belê lêkolîna nû nîşan didin ku bi tenê bejmara xêde ya axêveran tîra mîsogerkirina hebûna zimanekî naxin, ji bo mîsogerkirina hebûna zimanekî hêmana herî girîng veguhestina wî zimanî jî nişkêkî bo nişkêkî din e. Gelo çend zarok bi wî zimanî mezîna dibin, tiştê herî girîng ev e."

Min jî jêgiraneke dirêj a der barê rewşa zimanên xwecihî yên li Kanadayê dest bi vî nivîsarê kir. Bi rastî jî gelekî dişibe rewşa me, bi tenê nav diguhere, lê belê helwesta metîngeran li her cihî dişibe hev. Me ev jêgirana jî gotarekê wer-girt, di gotarê da qala rê û rêbazên vejiyandina zimanên xwecihî dike, di warê bikaranîna zimanî da balê dikêşe ser gelek faktoran ku yek ji wan jî faktora derûnî ye. Zimanek dema ku li ber çavên axêverên xwe bêqîmet bû, wekî zimanekî nezani û xizanîyê hate pênasakirin û bi vî rengî di dil û mêjiyê hinek axêverên zimanî da cihê xwe girt, êdî zindikirina wî zimanî gelekî zehmet e.

Nexwe divê em serê pêşîn zimanê xwe li ber dilê gelê xwe şîrin bikin. Xweşbextane lê jî beşeke mezîna a civaka me jî ziman û çanda xwe hez dike, dixwaze zarokên xwe bi zimanê xwe rake, lê belê beşek jî civakê çî vekirî çî jî veşarî, ji vî zimanî, ji vî çandê direve. Ev rewş jî bo me tenê ne wisa ye, ji bo hemû zimanên bindest wiha ye, lewra jî di gotara ku me li jorê qal kir da dibêje, "Ji me ra mamoste ne pêwîst in, bihişkên derûnînasîyê pêwîst in."

Em jî hemû divê serê xwe li ser rê û rêbazên geşkirina zimanê xwe, xweşkirina zimanê xwe li ber dilê hemû mirovan biêşîn. Em hemû bala xwe bidinê ka em ê çawa wî kurmê zimankuj ê ku nahêle dê û bav bi zarokên xwe ra bi kurdî bipeyvîn, ji nav dil û mêjiyê gelê xwe derxin. Ew xisletê xerab nahêle ku nîfşên nû hînî zimanê dayîka xwe bibin, ne vî dapirê jî hev ra dike du kesên biyanî ku jî zimanê hev fehmanekin. Ew neviya/ê ku dapîra xwe ya 80 salî mecbûrî wê tirkîya şikestî dike, ji xwe şerm nake, ji tirkîya wê ya şikestî şerm dike, hin caran jî henekên xwe bi tirkîya wê dike. Şerê pêşîn divê em li dijî wî kurmê zimankuj, hemû beşên civakê bikevin nav liv û tevgerê, xwedanên vî helwesta çewt li her cihî şermezar bikin. Şermezarkirina vî helwesta xerab, şermezarkirina rûşeyîya metîngerîyê ye.

Çeteyan hewl da bikevin Mexmûrê

Heftiya borî komek ji çeteyên DAIŞ'ê xwest bi dîzî bikeve Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr). Piştî Hêzên Parastina Cewherî (HPC) bi komê hesiyar ev hewldana çeteyan vala derket û çete reviyar. Li gorî agahiyan ji HPC'ê hatin wergirtin, bêyî ku şer rû bide çete neçar mane ji qadê birevin. Tevahiya rojê li ser asîmanê wargehê liv û tevgera helikopter û balafirên şer ji dom kir. Hêjayî bibîrxistinê ye ku 26'ê tebaxa 2016'an çeteyên DAIŞ'ê bi dîzî xwestin bikevin hundirê Wargeha Mexmûrê û di vê êrîşa xwekuj de gerîlaya YJA Starê Deniz Binevîş û welatîyê sivil ê bi navê Mehmet Arif jiyana xwe ji dest dabûn. **MEXMÛR**

16 welatan bertek nîşanî Iraqê da

Bertekên li hemberî tundiya li dijî xwe-pêşandarên Iraqê pêk hat, zêdetir dibin. Balyozxaneyên, Kanada, Xîr-watîstan, Çek, Finlandiya, Fransa, Almanya, Bûlgarîstan, Îtalya, Holanda, Norwêc, Polonya, Romanya, Spanya, Swêd, Brîtaniya û Amerîka bi daxuyanîyê hevbeş şideta li hemberî xwe-pêşandarên Iraqê protesto kirin. 16 welatên ku daxuyanî dan diyar kirin ku li hemberî xwe-pêşandaran tundiyeke mezîn tê bikaranîn û ev tişt nayê qebûlîkirin. Her wiha di daxuyanîyê de hat diyar kirin ku 500 kesan jiyana xwe ji dest daye û bi hezaran kes jî birîndar bûne. **HEWLÊR**

Partiyên Başûr çima bêdeng in?

Nîqaşên yekîtîyê li başûrê Kurdistanê jî didomin. Endamên partiyên siyasî yên li navçeyên Rizgarî ya Germiyarê tekdarî mijarê axivîn û daxwaz ji aliyên siyasî kirin ku di vê qonaxê de ji bo parastina gelê kurd yekîtîya neteweyî pêk bin. Endamê komîtîya Yekîtîya Nîştîmanî ya Kurdistanê (YNK) Şêrwan Mihemed diyar kir ku pêkhatina yekîtîyê pêwîstîyê e û ji bo rewşa her çar parçeyên Kurdistanê jî girîng e. Endamê komîtîya Hizba Komûnîst a Kurdistanê ya navçeyên Rizgarî Qeyis Enwer jî da zanîn ku Hizba Komûnîst her tim li dijî êrîşên dewleta tirk rawestiyaye û bêdeng nebûye lê mixabin partiyên din li hemberî vê bêdeng in. **HEWLÊR**

Divê hêzên biyanî ji Iraqê derkevin

Di 5'ê çileyê de parlamentoya Iraqê biryar da ku hêzên biyanî ji axa Iraqê werin derxistin. Di vê biryarê de başûrê Kurdistanê jî heye. Parlamentera Yekîtîya Nîştîmanî ya Kurdistanê (YNK) û Endama Desteya Yasayî ya Parlamentoya Iraqê Elmas Fazil diyar kir ku divê biryara ku hatî dayîn wekî qanûn ji parlamentoyê derbas bibe. Fazil da zanîn ku hikûmeta Tirkîyeyê êrîşên xwe yê li ser sînor berdebaran dîke û got: "Eger qala derxistina hêzên biyanî bikin, biryar hemû welatan digire nav xwe; Amerîka, Îran û Tirkîye jî di nav de ne. Bi taybetî nakokiyên siyasî dibin sedem ku serweriya axa Iraqê binpê bibe. Lewma biryara derxistina hêzên biyanî ji bo Tirkîyeyê jî derbasdar e." **KERKÛK**

Divê navbeynkar bêalî bin

Seroka desteya rêveber a MSD'ê Îlham Ehmed, derengxistina navbeynkariya di navbera rêveberiya xweser û rejîma Sûriyeyê de rexne kir û bang li Rûsyayê kir ku helwesteke bêalî nîşan bide

Navenda Nûçeyan

Ligel geşedanên Rojhilata Navîn ên demên dawiyê, mijara Rojava dîsa cihê xwe yê sereke girt. Meclîsa Sûriyeya Demokratîk (MSD) hewl dide ku aloziya li Sûriyeyê bi diyalogan çareser bike, ji ber ku rejîma Sûriyeyê û dewleta navbeynkar Rûsya bi nêzîkatîyên xwe çareseriyê bi derengî dixînin. Ligel hewldanên derengxistina diyalog û çareseriyê dîsa jî pêkhatiyên Rojava, MSD'ê, sazî û dezgehên sivil xebatên xwe didomin. Seroka desteya rêveber a MSD'ê Îlham Ehmed bi giştî rewşa Rojava û Sûriyeyê nixand û bal kişand ser politîkayên rejîma Sûriyê û Rûsyayê.

Ehmed di destpêka axaftina xwe de li ser Rûsyayê rawestiya û diyar kir ku Rûsya ji bo pêkanîna diyalogên di navbera Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û Rejîma Sûriyê di nav hewldanan de ye. Ehmed da zanîn ku car caran Rûsya mijara Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê wekî zext li hemberî Tirkîyeyê bi kar tîne ku hin tiştan bidest bixe.

Helwest girîng in

Ehmed di axaftina xwe de behsa belgeyên ku di demên dawiyê de di çapemeniyê de hatin belavkirin jî kir û got: "Ev belge ji gelek xalan pêk tên. Li gorî raporê



dê rêveberiya xweser û rejîma Sûriyeyê li hev bikin. Lê ev belge di esase xwe de tune ye û ji rastîyê dûr e. Tu xalên ku em bi rejîma Sûriyeyê re li hev bikin tune ne. Gelek caran hikûmeta Rûsyayê mijarên bi vî rengî belav dîke."

Ehmed, da zanîn ku ji bo li-hevkirina bi rejîma Sûriyeyê re bê kirin xebat didomin û wiha axivî: "Em ji bo diyalogan kedeke mezîn didin lê di diyalogan de qutbûnek heye û car caran jî diyalog dîskêkin. Helwest, armanc, hişmendî û rêbazên danûstandina rejîma Sûriyeyê diyalogan bi derengî dixê. Li vir helwesta Rûsyayê jî girîng e û heta astek hewl dide ku diyalogan bi derengî bixîne."

Îlham Ehmed, destnîşan kir ku tevî rêzecivîn û hevdîtînen li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hatin lidarxistin ji heta niha tu encamên ber bi çav dermeketî pêş û wiha dom kir: "Heke Rûsya rola navbeynkariyê bilîze divê bêalî û cidî be û piştî aliyekî li ser hesabê aliyê din negire. Lê tê zanîn ku hikûmeta Rûsyayê di tevahiya qadên navneteweyî û

hundirîn de piştigiriyeke mezîn dide rejîma Sûriyeyê. Hevalbendiya hikûmeta Rûsya ya bi rejîma Sûriyeyê re ji xwe diyar e. Ev jî rê li ber diyalog û çareserîya siyasî digire. Rûsya heta niha pêşniyarên ku tîrî kirin paşguh dîke û piştigiriyeke dide aliyên leşkerî."

Îlham Ehmed bang li Rûsyayê kir û got: "Divê hikûmeta Rûsyayê rêbaz û xeta xwe biguherîne. Bila guh bide mijarên wekî siyasî, çandî, sivil, civakî û aboriyê. Pêwîst e guhertin li ser tevahiya van mijaran hebin. Divê Rûsya ji bo çareserîya aloziya li Sûriyeyê bi awayekî cidî û bi bandor nêzî aliyên bibe."

Îlham Ehmed di berdewama axaftina xwe de bal kişand ser

daxwazên rejîma Sûriyeyê yên ji rêveberiya xweser a bi rêya navbeynkariya Rûsyayê tê kirin û wiha bi lêv kir: "Daxwaza rejîmê tevahî axa di nav sînorên Sûriyeyê de vegere bin desthilatdariya wê. Gotinên rejîma Sûriyeyê der barê rêveberiyên herêmî de ne zelal in û aloziyan çareser nakin. Bi milyonan penaber hene, sed hezar sivil bûne qurbanî û bi hezaran kes wînda û girtî ne. Em derengxistina çareseriyê red dikin."

Ji bo diyalogê kongre

Seroka desteya rêveber a MSD'ê Ehmed da zanîn ku derfetên gi-hîştina lihevkerî hene û ne zehmet in, bi lihevkerî re dikarin pirs-girêkên heyî çareser bikin. Kongreya ku dê li Kahîreyê jî bê lidarxistin bû mijara nixandina Ehmed û wiha axivî: "Kongre ji bo diyalogan e. Em wekî rêxistinê amade ne ji bo kongreyê. Em bi hêvî ne ku encamên erênî dê di kongreyê de derkevin."

Her wiha Ehmed tevînekirina komîtîya MSD'ê ya nav komîtîya qanûnê jî nixand û wiha got: "Em beşdarî komîtîya qanûnê nekirin. Lê der barê aliyên ku beşdar bûne de jî tu agahî nedan me. Di heman demê de jî têkilî û hevdîtînen me bi şandeya diyalogan re berdewam in û wê encamên wê di warê neteweyî de erênî bin. Divê tevahiya pêkhatiyên Sûriyeyê li ber çav bên girtin û li gorî wê çareseriyek bê dîtin."

Plana aştiyê ya Trump!

Navenda Nûçeyan

'Peymana Sedşalê' ya serokê Amerîkayê Donald Trump bû sedema nîqaşan. Demildest serokê rêveberiya Filistinê Mehmed Ebas bersiv da plana Amerîkayê û plan red kir. Ligel nîqaşan jî li çend bajarên Filistinê çalakiyên şermezarkirinê hatin lidarxistin.

Serokê Amerîkayê Donald Trump ligel serokwezîrê Îsraîlê Benjîmîn Netanyahu li Qesra Spî civîneke hevbeş a çapemeniyê li dar xist. Plana xwe ya aştiyê ya Rojhilata Navîn ku weke "Peymana

Sedşalê" bi nav dikir ragihand. Plana aştiyê 80 rûpel e û hem ji bo Îsraîlê û hem jî ji bo Filistinê hatiye amadekirin.

Trump di çarçoveya plana aştiyê ya Rojhilata Navîn de diyar dîke ku dê Orşelîm-Quds wek paytexta yekparçe ya Îsraîlê bê qebûlîkirin. Li gorî plana Trump dê ji bo Filistinê jî dewleteke serbixwe ku paytexta wê rojhilatê Orşelîm-Qudsê be diyar dîke, lê der barê paytextê dê kîjan bajar be tu agahî neda. Li gorî plana aştiyê ya Rojhilata Navîn ji bo pêkanîna merca ku Filistin bibe dewleteke serbixwe, pêvajoyeke 4 salî lazim e. Li gorî

plansaziya Trump filistinîyên koçber dê biçin dewleta xwe ya di demên pêş de bê avakirin û dê li Îsraîlê nemînin.

Çend îsraîlî erênî nêzî planê bû lê belê filistinî wê planê red kirin. Serokê rêveberiya Filistinê Mehmed Ebas bertek nîşan da û got Quds-Orşelîm jî bo firotinê nîn e û dewleta Filistinê bêyî paytexta Quds-Orşelîm nabe. Ebas got: "Dê dawîya vê planê ne baş be. Jîdestçûna Qudsê mal-wêranî ye. Ev planeke têkbinî ye. Dê mijarê bibin dadgeha navdewletî." Ligel aşkerîkirina plana Amerîkayê li Xeza, Refah, Nablûz û Ramallahê bi hezaran kes daketî qadan.

Zextên li ser gel hatin rexnekirin

Koma Xebata Analîza Periyodîk a Konseya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî di çarçoveya lêkolîna karneya Tirkîyê ya mafên mirovan de, li Ofîsa Neteweyên Yekbûyî ya Cenevreyê panelek li dar xist. Di panelê de bînkîrîna mafên mirovan a li Tirkîyeyê yek bi yek hat nixandin.

Di panelê de bi taybetî rewşa girtiyan û girtiyan nexweş hat nîqaşkirin û daneyên Komeleya Mafên Mirovan hatin parvekirin. Li gorî daneyan li girtîgehan 458 jê giran bi giştî hezar û 334 girtiyan nexweş hene, di sala 2019'an de 40 girtiyan jî ber nexweşiyên giran jiyana xwe ji dest dane.

Her wiha zextên li ser rojnameger, nûnerên mafên mirovan, akademisyen, siyasetmedarên muxalîf û hevşaredarên ku ji peywîrê hatine dûrxistin jî di panelê de hatin nîqaşkirin.

Mijara din a ku di panelê de hat nîqaşkirin jî bikaranîna çekên kîmyevî bû. Ji Însiyatîfa Parastina Rojava bijîşk Abbas Mansûra yê swîsreyî bal kişand ser vê mijarê û got ku di çileyê 2020'an de tîkîdarî bikaranîna çekên kîmyevî ya dewleta tirk a li hemberî Rojava raporek weşandine. Mansûra wiha axivî: "Parçeyên ji birîndaran hatine girtin di laboratûarên nexweşxaneyên Ewropayê de hatine lêkolînîkirin. Di encama lêkolînan de derket holê ku çekên kîmyewî hatine bikaranîn û hatine tomarkirin. Divê tirkîye jî ber sînorên kirine di dadgehên navneteweyî de were darizandin."

Nûnerên dewletan gotin ku Tirkîye gelek pêşniyarên berê li ber çavan negirtine û divê Tirkîye rêzê ji hiqûqa navneteweyî re bigire. **CENEVRE**

Vîrûsa Koronayê li cîhanê belav dibe

Li bajarê Vuhanê Çînê vîrûseke nû derket holê. Di kesên vîrûs li wan peyda bûye de enfeksiyona rêya hilmijînê tê dîtin. Ev vîrûs di nav çend heftayan de bi lez û bez belav bû û ji bilî Çînê, di heman demê heta niha li zêdetirî 16 welatên din hatiye tespîtîkirin. Mirinên bi sedema vê vîrûsê, her ku diçe jî zêdetir dibin. Vîrûsa Koronayê cara ewil di meha kanûna 2019'an de derket holê.

Bajarê Vuhanê ku cara ewil vîrûs lê hatiye tespîtîkirin, niha di karantînayê de ye. Di çarçoveya

pêşgiriyan tenduristîyê de, nayê hiştin ku 50 milyon kesên li van herêman rêwîngiyê bikin. Nayê zanîn bê ka şewba vîrûsa koronayê şewbeke demkî ye yan dê domdar be. Ji bo pêşîlêgirtina belavbûna vîrûsê, li Çînê di serî de kesên bi vê şewbê ketin dixin karantînayê. Li van bajarê her wiha kafe, sînema, konser û eywanên pêşangehan jî heta demekê hatine girtin. Li bajarê Vuhanê rûpoş li her kesî hate ferzîkirin, rêwîti hate sînorîkirin, kamerayên germa laş

tespîtî dikin li balafirgehan hatin bicîhkirin û bazara masiyar jî hate girtin. Li hêla din li gelek welatên cîhanê jî pêşgiriyan cur bi cur hatin wergirtin. Rêxistina Tenduristîyê ya Cîhanê (WHO) jî ber vîrûsa li Çînê derketî û li gelek welatên din jî belav bûye hişyariya "ji bo tenduristîya raya giştî ya navneteweyî rewşa lezgîn" da. Hêjayî bibîrxistinê ye ku herî dawî hejmara kesên ji ber vîrûsa koronayê li Çînê jiyana xwe ji dest dane derket 210'an. **AMED**

Aboriya pergala navneteweyî pirani girêdayî bazara serbest e û bazara serbest jî girêdayî serdestiya hiqûq û pêşveçûna demokrasiyê ye. Li gorî pîvanên bazara serbest, hiqûq û demokrasiya çiqas sazibûyîna xwe bi pêş bixin, ewqas derfet jî bo belavkirina dahatê ya biedelat derdikeve holê.

Ji bo pêşveçûna civakên rojavayê cihanê, filozofê Almanyayê Max Weber li ser vê yekê têkiliyên hiqûq, aborî û civakî gelek lêkolîn û xebatên balkêş kirine. Di xebatên xwe de Max Weber tîne ziman ku pêşveçûna civaka girêdayî berhevkerina sermiyan e û jî bo fehmkirina berhevkerina sermiyan jî exlaqê protestan (serhildêr) pêwîst e. Di xebatên xwe de Max Weber, civakên ku demokrasiyê û hiqûqê bi kar tînin û yê ku li ser ol û oldariyê pir zêde disekin, dide ber hev. Civakên ku sazibûna xwe bi exlaqê serhildêr jî bo demokrasiyê û serdestiya hiqûqê pêk tînin pêşveçûna wan, jî civakên oldar gelek zêdetir dibîne. Li gorî encamên xebatên Weber, civakên wek Almanyayê, welatên Îskandinavyayê ku hiqûqa sekularîzmê ya bi exlaqê serhildêr di warê aborî û zanîstê de pêk tînin li gorî civakên wek Îtalyayê, yewnaniyê ku katolik in, zêdetir pêşve diçin. Ji ber vê Weber dibêje, "Ji bo fehmkirina pêşveçûna civakê fehmkirina berhevkerina sermiyan pêwîst e, jî bo fehmkirina berhevkerina sermiyan jî fehmkirina ruhê kapitalîzmê û şexsiyeta kapitalîst pêwîst e. Ji bo vê fehmkirinê jî, exlaqê serhildêr pêwîst e."

Di sedsala 19 û 20'an de çiqas aboriya cihanê di nav civakên demokratîk de bi pêş ketibe jî, dîsa jî her dem pêwîstî bi reformên jî bo pêşveçûnê çêdibe. Ji Peymana Magna Cartayê ya di sala 1215'an de ku li Îngilîstanê hatiye îmzekirin heta niha, jî ber ku hiqûq misogeriya mafên welatiyan li hember desthilatê diparêze, di pergala bazara azad de cihê



Aborî û Civak
Ramazan Tunç
ramazan.tunc@live.com

Serdestiya hiqûqê û aborî



gelek girîng digire. Qeyranên aborî, bi piraniyê piştî qeyranên demokrasiyê û hiqûqê, xwe zêdetir nîşan didin. Wek minak, di sedsala 20'an de her tim di dawîya qeyrana demokrasiyê û hiqûqê de qeyraneke aborî hatiye û serên cihanî, navneteweyî dest pê kirine. Piştî têkçûna Yekitiya Sovyetan

rojawayê cihanê derfeta ku bazara serbest dorferê bike bi dest xist û pêvajoya globalîzmê gelek welatan jî bo entegrasyona (nişgirtina) demokrasiyê reformên hiqûqê pêk anîn. Di vê pêvajoyê de Tirkîyeyê jî ku xwe wek welatekî nêzî Yekitiya Ewropayê (YE) dît û dest bi reformên hiqûqê,

pergal û demokrasiyê kir û xwest ku hiqûq, mafê kesan û saziyan di warê aboriyê de misoger bike û bi ewle bike. Di vê pêvajoya globalîzmê de, Tirkîyeyê aboriya xwe bi xêra piçek demokrasiyê û serdestiya hiqûqê hinek pêş xist. Lê mixabin piştî 2015'an Tirkîyeyê hêdi hêdi dev ji nixirên YE'yê berda û niha di qeyraneke demokrasiyê, hiqûq, aborî û civakî de ye.

Ji ber ku paradîgmaya "Neteweya Demokratîk" wek ku Max Weber aniye ziman exlaqê serhildêr û ruhê kapitalîzmê baş analîz dîke û bi kûrahî dinirxîne, jî bo demokrasiyê, hiqûq û aboriyê wek derman e. Ev derman jî, di nav neteweyekê demokratîk de tenê dikare ruhekî jî xwe re çêbike. Di neteweya demokratîk de serdestiya hiqûqê jî misogeriya, ewlehkariya aboriyê ku parvekirina dahatê bi edalet e û parvekirina aramiyê ye. Çarenûsa pirsgerêkên makro yê Tirkîyeyê ku qeyranan derdixê holê û bi van qeyranan xwe diafirîne, di serdestiya hiqûqê û demokrasiyê de ye. Serdestiya hiqûqê û demokrasiyê jî exlaqê neteweya demokratîk ku di heman demê de exlaqê serhildêr e, pêkan dibe. Politikayên ku demokrasiyê û serdestiya hiqûqê binpê dîke aboriyê jî tengav dîkin. Politikayên ku dibin sedema tengavî û qeyranan, karê kesên "aqilsivik, bargiran" in.

Gotinek ji Gotinên Pêşiyên Me

Aqilê sivik barê giran: Ji bo kesên ku di biryarên xwe de bê binge û agahî, bi lez û bez tevdişê û barê xwe giran dîkin, derdora xwe tevlihev dîkin, derdora xwe geremolî, gemaî dîkin tê bikaranîn.

Xweşkanî



Felemez Ulug

Artêşa veşarî

Di van çend salên dawî de, dewleta Rûsyayê bi şewazeke nûh mudaxleyî herêmên şer dîke. Li Rûsyayê şirketên ango grûbên leşkerî yê hatine avakirin, çiqas û di çi astê de bi dewleta Rûsyayê re di nav têkiliyê de ne?

Ji van şirketan a bi navê Grûba Wagnerê di qada navneteweyî de mîna şirketekê dewleta Rûsyayê tê ditin. Lê şirketên leşkerî ew şirket in ku, bi tu awayî bi dewletan ve ne girêdayî ne û ew jî hêla dewletan ve nayên finansekirin. Ew bi karê dikin re xwe finansê dîkin. Yanî mîna hemû şirketên heytî ew jî kar dîke û baxa xwe dide dewletê. Lê şirketa Grûba Wagnerê ya rûsî di rastiyê de ne fermî ye, jî ber ku li gorî zagonên Rûsyayê avakirina şirketên wiha qedexê ye. Lewma rêveberiya Moskowê jî têkiliyên xwe yê bi vî grûbê re red dîkin.

Navê Grûba Wagnerê jî fermî nîne. Avakarê vî grûbê Dmitry Útkin, bi navê kompozitorê alman Wagner tê naskirin. Útkin beriya niha jî li Sûriyeyê di nav "Kolordiya Slavyan" de cih digirt. Piştî jî wir derket û şûn ve Grûba Wagner ava kir.

Hin pispor dibêjin ku agahiyan di çapemeniya welatên rojavayî de yê der barê Grûba Wagnerê de tîne belavkirin şaş in û ev agahî jî derveyî propagandaya Rûsyayê wêdetir tiştekî din îfade nakan. Lê armanca vî berguhertinê jî ew e ku tê gotin dixwazîna grûba leşkerî ya di nav wezareta parastîna de kar dikir ku bi navê Kolordiya Slavyan dihat naskirin, piştî veguherandina Grûba Wagner û bi vî awayî wê vedîşêrin. Em jî bir nekin ku damezirînerê Grûba Wagnerê Dmitry Útkin, heya sala 2013'an jî di nav îstixbarata leşkerî a rûsî GRU'yê de kar dikir.

Grûba Wagnerê heya sala 2017'an yekser jî hêla GRU'yê ve dihat birêvebirin. Hemû pêdiviyên vî şirketê jî hêla dewleta Rûsyayê ve dihatin pêşwazîkirin. Herî dawî bi serkeftinê li Sûriyeyê bidest xist, ev şirket serbixwetir bû. Lê jî bo zêdetir dernekeve pêş û balê nekişîne li herêmê hin xebatên wê hatin sekinandin.

Her çiqas li ber çavan xwediyê Grûba Wagnerê wek Dmitry Útkin bê ditin jî di rastiyê de ev şirket ya karmendê rûs Yevgeny Prigozhin e. Prigozhin kesekî zêde têkildarî karê politikayê nabe. Lewma ev kes zêde li ber çavan jî nîne. Lê ev kes bi nêzîkatiya xwe ya bi Pûtin re tê naskirin. Bi hemû karên Pûtin re eleqedar dibe û jê re xwarinpêjê Pûtin tê gotin.

Di van demên dawî de dewleta Rûsyayê pêşveçûn û bûyerên li qada Afrîkayê diqewimîn jî nêz ve dişopîne. Lê di rastiyê de jî bûyerên diqewimîn zêdetir, bi dewlemendiya herêmê re eleqedar in. Lewma Kremîl jî bo bandora xwe li vî herêmê ava bike, bi rêya şirketên mîna Grûba Wagnerê ve derbasî herêmê dibe. Mîna Sûriyeyê ew ev şirket di serî de berî xwe bide dewlemendiyan herêmê. Di halê heytî de li gorî agahiyan heytî, jî bo Grûba Wagnerê li hin komarên welatên Afrîkayê madenê elmas û dewlemendiyan xwezayî biparêze li hev kirin çêbûne. Rûsya bi rêya şirketên leşkerî dixwaze bandor li ser welatên aloz bike. Bi taybetî jî li ser welatên xwe nêzî tifaqa NATO û YE'yê dibînin disekine. Wisa diyar e ku Pûtin jî bo berjewendiyên xwe de van şirketên leşkerî bi kar bîne. Heta niha Grûba Wagnerê û şirketên din ên leşkerî erka xwe pêk anî. Ev jî tê wateya ku ew jî bo erkên nû amade ne. Di encamê de bûyerên di dirêjkê de hatine pêk hatine bi her awayî aşkera dîke ku bawerî bi şirketên leşkerî nayê. Lê jî bo çend siyasatmedar bigihên armanca xwe herdem wek şewazeke baş hatiye ditin. Di vir de yê wîndî dîkin dîsa welat û gel in.

Hiwa Khoshnaw



Jeo-Polîtîkaya nû û bandora wê -2-

zextên dewletên neteweyî, biryar û planên wan hilweşînin.

Ez bi guman im ku Dewletên Yekbûyî yê Amerikayê (DYA) dê jî bo kurdên Rojava projeyek wê hebe. Tiştên ku derdikevin holê ew li ser pêkanîna hevşengî/denge di navbera kurd û Tirkîyeyê de kar dîkin. Bi vî rengî dixwazîna kartên kurd û tirkan li hember hev bi kar binin.

Piştî hilweşîna rejîma Seddam a sala 2003'an, Tirkîyeyê bi berdemamî gefan li kurdên Iraqê dixwarin. Di sala 2008'an de, Amerika neçar bû ku rêyê bibîne ku Tirkîyeyê jî hêrs nebe û parastina derdesthilata piçûk û qels a kurdan jî bike. Di dawîya sala 2000'an de, Barzaniyê biçûk jî Tirkîyeyê re got: "Tank û topan neşînin, lê kamyonan bişînin." Wek tê zanîn, piştî Rûsyayê, başûrê Kurdistanê saheyeke herî mezin a bazirganiya Tirkîyeyê ye û para Tirkîyeyê jî bazara neftê gelekî zêde ye. Niha gelek şewirmendên siyasî yê Koşka Spî dibêjin, em dikarin heman siyasatê li ser Rojava bidin meşandin, ew jî bazirganî yan jî bi başûrkirina Rojava ye!!

Lê, Jim Hanson serokê koma lêkolînên ewlehiyê ye û di Hêzên

Taybet ên Artêşa Dewletên Yekbûyî de xebitiye. Ew di lêkolîna xwe ya herî dawî de dibêje ku "Dibe xweserî û parastina jî bo kurdan dê bibe stratejiyekê nû jî bo Amerikayê li Rojhilata Navîn".

Pêşeroja Kurdistanê (Başûr)

Mîna di beşa yekemîn de behs kir ku herêma otonom a kurd a bakurê Iraqê (Başûr) projeyek welatên rojavayî bû (bi taybetî hewla serokwezîrê Fransa F. Mitterrand) jî bo hin armancên wan li dijî dewletên neteweyî yê Rojhilata Navîn. Amerikî nahêlin ku ev herêm mezin bibê (li encamên referandûmê yê 2017'an binihêrin) û her wîha rê nadin ku ew tîk biçe an jî êrişên giran li ser bînin kirin. Di vî navberê de, jî bo piştrastkirina Tirkîyeyê ku devera kurdî bandorê li ewlehiya Tirkîyeyê û kurdên Tirkîyeyê neke, li gorî wan pêwîst bû ku Enqere herî zêde sûd jî bazirganiya petrolê bibîne. Ji aliyekî din ve divê ev herêm jî Tirkîyeyê re vekirî be ku karibe êrişê gerîlayên HPG û PKK'yê bike. Xuyaye ku elîta siyasî ya Başûr jî jî vî rewşê razî ye. Çawa li Sûriyeyê hêzên hegemon bi taybetî Amerika, dibe asteng li hember rêkeftina di

navbera Rojava û hikûmeta Sûriyê de, li Iraqê jî ev yek didomîn, lê elîta başûr jî bi hêsanî dikeve nav leyîstokên wan û ew jî Iraqê demokratîk naxwezî û hêşmendîya wan a 'neteweperesî' tîrî vî yekê nake. Jixwe ji sala 2003'an û pêve zemîneke demokrasiya rasteqîn li Bexdayê derket holê. Wê demê kurd dikaribûn bibin motora demokrasiya Rojhilata Navîn. Genêlî, armancên wan ên aborî ya talankar û têkiliya wan a bazirganî bi AKP'yê re, ew ber bi qumara referandûmê ve birin.

Rojhilatê Kurdistanê û Îran

Her çend Amerika/Îsrail bandor li Îranê dîkin û jî ber vî yekê jî pêdivî bi Rûsan heye ku li hev bikin, lê jî bo kurdên Îranê hîn jî projeyek wan nîn e. Di salên dawî de, aliyên siyasî yê rojhilata Kurdistanê, pê hesiyane ku jî bo kurdên vî herêmê tu planên rojavayî tune ne. Kurd danûstandina xwe ji hikûmeta Tahrânê re tînin ziman. Li gorî ragihandinê, di navbeyna her du aliyan de, çend civîn encam dan. Divê kurdên Rojhilata jî ezmûnan ders wergirin, xwe bihêz bikin û hêviya xwe tenê li ser xistina rijîma Tahrânê girênedin. (didome...)

Êrişê li ser Rojava, ku ji 10'ê îlona sala 2019'an heta îro berdewam e, di siyaseta navneteweyî de guhertinên nû derxistin holê. Bûyerên sala borî diyar dîkin ku Amerika li Rojhilata Navîn kontrola xwe wîndî kiriyê. Siyaseta Trump ev e ku ewlehiya Îsrailê garantî bike û pêşî li berfirehbûna Îranê ya li herêmê bigire. Ji ber vî yekê heke lazîm be, ew dikare gav paşde bavêje û bi rêya Tirkîyeyê ew dixwaze vî tifaq û valahiye tîjî bike. Biryara Trump a îlona 2019'an ku leşkerên wan vegeyîyan Iraqê û dîvre jî tenê çavkaniya neftê dagir kirin, tenê jî bo wê ye ku nehêla Rojava bigihîje rêkeftînek bi Sûriyeyê re.

Bi êrişê Tirkîyê re, pirsgerêka kurd zêdetir bû cihanî, di heman demê de piştewaniya raya giştî ya cihanî bi dest xwe xistiye. Xala dawî di siyaseta navneteweyî de tiştêk nû û girîng e. Me dît ku piştî Trump lempeya kesk pêşiya Tirkîyeyê hel kir ku êrişê Rojava bike, bi gelemperî karvedana dewletên neteweyî ewqas ne xurt bûn. Lê paradîgma û modela siyasî ya Rojava bandor li gelên rojavayî kiribû û cara yekem e ku gel li dijî

Rewşenbîr, zanyar û welatperwerekî hêja



Abdulkadir Ulumaskan

Mixabin, em kurd, di jiyane de bi nixen kesayetên xwe yê neteweyî û giranbiha zêde nizanin. Bêtir piştî mirinê em wan bi bir tînin û zû ji bir dikin. Divê mirov wek civak, her dem nîrx û nîrxdarên xwe yê neteweyî di hişmendîya xwe de zindî bike. Ev nîrxşinasî ji bo pêşketa kesayet û pêşveçûna civakê ji gelekî girîng e. Rewşenbîr; bîr û hişmendîya civakê ne. Civaka hişmendî û hişmendên xwe baş neparêze, civak nikare zêde serkevtî û serfiraz ji bibe. Ev di heman demê de wek pîvaneke sincî/exlaqî, presîbêke rêzgirtina ji keda mirovan re ye. Kesayetên ji civak û neteweya xwe re xizmetê dikin, ne tenê nîrxên neteweyî yê mirovatîyê ne jî. Divê ev kesayet her dem wek mînaka bîra neteweyî û mirovî bîn bibirandin û derbasî nivşên bê bibin.

Ez ji Kek Doktor Zerdeşt Haco re temenekî dirêj, bi tenduristî û bextewariyê hevî dikim. Ji ber sedemên li jor, ez dixwazim hêj li jiyane ye, hinekî bahsa taybetmediyên wî bikim. Mebesta min ne nivîsandina jiyan an kurtejiyana Kekê Zerdeşt e. Ji vê bêtir ez dixwazim, hinekî behsa hêjayî û rûmeta jiyanê wî ya kurdewar bikim.

Kekê Zerdeşt ji malbateke pêşengên kurd a navdar û welatparêz, ji Mala Haco ye. Bi piranî kesên malmezînin hinekî qurê û pozbilind in. Lê Doktor Zerdeşt mirovekî pir nazik, dilnîm, li hember her kesî rêzdar û xweşbîn e.

Kekê Zerdeşt Haco ev 50 sal in li Ewropayê dijî. Bû 25 sal, ez bi xwe bûme şahidê welatperweriya wî û 25 salên berê jî min bîhiştîye ku ew wek rewşenbîr, zanyar û welatperwerekî kurd, her dem, di nav doza gelê kurd de bi awayekî çalak cihê xwe girtiye û gelekê xebat û xizmetên giranbuha kirine. Hema hema di her qadê de di nav doza kurdî de tekoşînek gelekî hêja daye. Ev helwest û jiyan wek helwesteke neteweyî pir hêja û bi rûmet e.

Taybetiyek me gelekê kurdan a balkêş heye ku di gengeşiyê de, em ji mijarê bêtir, dixwazin xwe derînin pêş û pesnê xwe bidin. Pirê caran di civînan de, em dixwazin zanîna xwe bidin nîşandan. Di vê rewşê de ne kes dikare me zêft bike û ne jî em dikarin xwe zêft bikin. Lê di gelekê civîn, gengeşe, semîner û konferansan de min li Kekê Zerdeşt guhdarî kiriyê û tu carî min hest nekiriyê ku ew zanîna xwe ya akademîk an zîmanzanîya xwe derxistibe pêş an jî dîtina xwe li ser kesên din ferz kiribe. Her car zanîn û dîtina xwe bi zîmanekî maqûl û kibar diyar kiriyê. Ev wek tîgîhiştin û helwest taybetiyekê gelekî maqûl e û mixabin ev bi gelemperî di nav me de pir kêmtir e.

Ji ber vê yekê jî bi rastî ez Kekê Zerdeşt wek fîmsala nazenînî û xweşbî-


niya kurdî dibînim. Dema bi mirovan re dipeyive; bi zîman û dengêkî wek hevrişim nerm, şîrîn, kibar, ji dil û bi rêzdarî dipeyive. Melodiya peyvên kurdî bi devê wî mirov hejmetkar di-hêla ku mirov lê guhdarî bike.

Loma jî gelekê caran min gotiye û ez dibêjim: “Kekê Zerdeşt fîmsala xweşikî, şîrînî, xweşbînî û nezaketa zîmanê kurdî ye.” Di hitabkirinê de gotina: “Xwûşk û birayên delal!” Ji peyva “birêz, an rêzdar” xweştir û dilnîmîr e. Kekê Zerdeşt jî gelekê caran bi vê gotina deng li civatê dike. Ew dema bi mirovan re dipeyive bêyî peyva “Keko û Bira” kêmtir dipeyive.

Kekê Zerdeşt ne tenê bi kibarî, nezaket, nefsbûkî û xweşbîniya xwe; bi zanyariya xwe jî zîmanzanekî kurdî hêja ye. Ew mamosteyê mamosteyan ne. Min jî li ber destê wî dersên zîmanê kurdî dîtine û jî wî gelekê tişt fêr bûme. Di sala 2010’an de li Almanya li Zanîngeha Bonnê Dr. Zerdeşt dîrsa mamosteyên kurdî dida. Li wir ez jî şagirtêkî wî bûm. Ew ne bi tenê teorîsyenê zîmanzanîya kurdî; dîldar û kedkarê zîmanê kurdî ye jî. Wî li Ewropa û Almanayê jî bo pêşketa zîmanê kurdî, gelekê karên pratîkî yê hêja kirine. Ji van, xebateke herî giranbuha jî di sala 1993’an de li Almanayê bi pêşengiya wî, zîmanê kurdî li dibistanan bi fermî wek dîrsa zîmanê dayikê hatîye qebûlîkirin. Ev 27 sal in ev ders berdewam dikin. Heta niha bi dehhezaran zarok û ciwanên kurd bi xêra serê wî dersên kurdî dîtine û hîn jî dibînin. Wek mamosteyekî zîmanê kurdî, ez xwe, van zarok û ciwanan, tevî dê û bavê wan xwe spasdar û deyndarê keda Zerdeşt dibînim.

Wek endamê rêveberiya Yekitiya Mamosteyên Kurd li Ewropayê, dixwazim, di vê mijarê de bi du - sê hevokên dinê behsa teybetmendiyekê din a Kekê Zerdeşt bikim. Doktor Zerdeşt ji destpêkê heta îro her dem di kar û barê mamosteyên kurd de bûye alîkar û pêşeng. Dema hewcedarî çêbûye wî her tim; alîkarî, piştgirî û şewirmendî kiriyê. Xwedê temenê wî dirêjtir bike, Kekê Zerdeşt niha 70 salî ye. Tevî hin pîrgîrîken tenduristiyê jî hîn bi awayekî çalak di nav kar û xebatên kurdî de ye. Heta demek nêzik jî Doktor Zerdeşt serokê Nivîskarên Kurd (PENa Kurd) bû û wî bi awayekî demokratîk û serkeftî serokatîya gelekê sazîyên kurd ên dinê jî kiriyê û hîn jî hinekan dike.

Di demek ne zêde dûr de, kongreya Yekitiya Mamosteyên Kurd heye û ez ji nuha ve Kekê Zerdeşt Haco wek Serokê Rûmetê yê Yekitiya Mamosteyên Kurd li Ewropayê pêşniyar dikim. Ez pêşîn bawer dikim ku hemû endam û rêveberiya me jî ew ê bi kêfxweşî û serbilindî vê pêşniyarê bipejirînin.



Mortal
Selîm Temo

Li Newala Qeremûsê Eliyekî bîra hebû. Cara çuyî min li ser guhertoya Aslika Qadir dixwîne nivîsî. Vê carê dixwazim li ser ya Salihê Beynatî binivîsim û deşifrasîyona stranê pêşkêş bikim. Lê min gotibû; ez weke her car peyvek an çend peyvî dînim.

Salihê Beynatî (1938-1984). Dîbêjî qey yekê jî malê bû. Çi cara navê wî hildidan, berê meriv diket çiyayên li piştî pîra Malabadê. Dibe ku hatibe mala me jî, nizanîm. Yan hatîye, yan jî min xeyala hatina wî kiriyê. Dengê wî hê jî olan dide li kavilê zarokatiya min.

Dixwîne, dipertîne. Kêmtir dengbêjî wekî wî jî kezzebê dikin gazî.

Dengbêjî bi salan li Qeremûsê maye, lewra cografîyaya herêmê û bûyerê baş dizane.

Deştêka pahn wek kefa destî jî gundên wek Qoca, Hilêliyê û Belawela ber bi Newala Qeremûsê ve qam bi qam bilind dibe, diçe digîje Pîleka, Sergewra, Dêrika Emê Reşo, Mîrzebegan, Xîncika û Aqûba.

Eli û Xelîl du bîra ne, ligel epe xwe, 1937an de qesta Bixetê kirine. Li vê “erdanenas” in û guhbel bi wan hesiyane. Tîrek ji rêxistîna guhbelan digîje Selatê, yek digîje çiyayên mala Eliyê Ünîs xwe spartîne.

Smayîlê Biro, ji Qoca ye û zavê Mala Eliyê Ünîs e. Sebriyê Hecî Ünîvê “ixbarçî” jî ji Qoca ye.

Hin dengbêjî dibêjin “tatârê Şêx Mihemed”, lê ew “satar” e. Satar, ji darên bejnîkurt pêk tê, wek “makî.”

Em stranê jî devê jînekê dibîhîsin ku ji xwîska xwe re dibêje “gulîbirê”. Kek Hemîd Kiliçaslan dibêje: “Berê gava yek di xortaniya xwe de dîmir, rituela şînê bi vî rengî digeriya: Du dar wekî xaç bi hev ve girêdidan û diçikandin ku jê re digotin ‘darok.’ Xwîska miriyê birayê mirî bû, porê xwe kurr dikir û li darokê badida.” Qest jî peyva “porkurr” jî eynî ye. Wek ku bêje, “wey, bila birayê te bimire!”

Qepitan (capitaine), serpel (uzbaşı) e; dengbêjî vî peyva Frensî wek Ereban bi lêv dike: Qefitan.

“Keya” mixtar e, “keyxo” jî dibêjin. Di hin stranên dengbêjiyê de qertafê pirjimariya Tîrkî tînin bikaranîn. Wek “begler”, “axaler” û “keyaler” a vî guhertoyê.

Bala xwe bidîne, vehênana dengbêjiyê pêşî dorhêlek datîne û hêdî hêdî ber bi navenda “çirok”ê ve diçe. Tu dibêji qey kamîra ye û bi “zoom”ê diçe ser lehangên û bûyerê.

Îca ka guhê bidin Salihê Beynatî ka çi dibîne û dibêje:

De lê beylê beylê, beylê beylê, beylê beylê, Heylê beylê, beylê beylê, beylê beylê, beyla wayê Lê Xwedayê min zane, bila kula Xwedê bi sê kula’ be, Bikeve derê mala Smayîlê

Hirçê Kezebşewitî

Biro, Çewa îro serê çendik û çend roja’ li pey peyayê’ mala bavê min îxbarçî ye Lêbelê, serê vî sibekê cabekî daye merkeza Silvana, Îro giran e eskerê merkeza Silvana, lê Yedîncî Qolordîya Diyarbekir, Bekçiyê Bismilê ket’ne Newala Qeremûsê, satarê Şêx Mihemed, Kanîka Temo, Aşê Reşo, Seriya Qoca, beta dora Hilêliyê Lê Xwedayê min zane, şade ‘w şûde berxê mala bavê min li dinyayê gelek hebûn, Li çarşîya Qamişloyê, Qefitanê Fireng jî wan re sa’bet (subbet) dike,

Digo’ “Ez ê li va’ peya dinêrim, fena coteke zabitê Hemêdiyê.” Bi salîsdanê xelkê, roja şerê Newala Qeremûsê, Lê qerdela bekçiyê Bismilê li ser berxê mala bavê min dikin zordestîyê. Lê Emîne dîgo’, “Taqîb e, Wesîle, xweyê, gulîbirê; Bejna Xelîl û Eliyê min, di van torîne mala bavê min rebenê zîrav e, Ta’k ribana Sasîn, xwe rebeno bêşîn dike li serê hemû ta’ta, Ema ji xêra mala Xwedê ra, birra îro ev kaxizê nexerê, Cihaba sar a cemidî jî xweka te ra nebata

Lê lêbelê çî bikê, ji xêra sed mala Xwedê ra, Gava li ser berxê mala bavê mi’ rebenê dibû pêsirtengî, Bila wêga ji wa’ ra bihata serê henara Ünîs û Evdîrehman, Qewmê çiyê, lê hirçê kezzebşewitî, gurê serê dax û çiya Gêlî Silvana, e’ ji we ra sond dixwim, wê xwe bavêtîna ser berata’ Lê Emîne dîgo’, “Taqîb e, Wesîle, xweyê, gulîbirê, Şereka li me çêbû li Newala Qeremûsê, li satarê Şêx Mihemed, Li Kanîka Temo, xwe rebeno şer giran e roka Înê.

Ema birra kula Xwedê bi sê kula’ be, bikeve derê mala Smayîlê Biro, Sebriyê Hecî Ünîs, şex payî Emîne Zîne Çewa serê vî sibekê cabekî dane merkeza vî Farqînê, Têlekî dane Yedîncî Qolordîya Diyarbekir, esker giran e,

Xwe rebeno cema’ dikişîne Lê Xwedayê mi’ zane, seet li çare şevê bi şîn da, Eskerê giran ketiye Newala Qeremûsê, satarê’ Şêx Mihemed, Kanîka Temo, li Aşê Reşo, li ser berxê’ mala bavê mi’ rebenê girtiye kozîkê û kemîne Haya berxê’ mala bavê mi’ rebenê get ji bayê felekê tinîne, Lê Xelîlê Mala Nasir, peyaki delûdîn î çavbixwîn e Ema bi nîvê tîngê digre ji destê cendirmakî distîne, Bi sê dengê li berxê mala Eli dikir gazî, dîgo’:

“Lawo, wîne çar tiliya’ serê xwe ji mi’ re derîne, Mi’ îro sond xwariye bi sonda temam, Ne ji vî eskerê giran be ti car mîkûna we ji ber destê min tinîne.” Lê Xwedayê mi’ zane, berxê mala Eli naşt in, Ti car û ti car ta’n û niçê mîra’ li xwe nedîne, Bi sê dengê li Xelîlê Mala Nasir dikirin gazî, dîgo’:

“Lawo, emê makûm û firar in, lê ti terş û talanê te li pêşîya me tinîne. Ema ti yê çar tiliya’ serê xwe ji kekê xwe re derîne.” Lê Xwedayê mi’ zane, berxê Mala Eli serê xwe dide ser nîşana mîrata modalîyê, Çavê çepê digre, çavê rastê li serê namîqîne Lê derbekî li bejn û bala Xelîlê Mala Nasir dixîne, Şal û şapikê trîko, keirasê felemez, piştî elêl, kosteka seetê, Lê şîşa durbînê, beta panîka gonderê di xwîna sor de dixcêmîne Lê Emîne dîgo’: “Gulîxanê, xweyê, rebenê, Ti rabe here xwe bavêje tol û bextê keyalêr Silvana.

Ez ê bîjim gêlî keyalêr Silvana, ez ket’me bextê û Xwedê da Eger qisûreka berxê mala bavê min bebe, naşt in, Ke’no erda xerîb û nenas, xwe rebeno rê nedîne.” Ema ji xêra mala Xwedê ra, gava li ser berxê mala bavê mi’ rebenê dibû pêsirtengî, Bila wêga ji wa’ ra bihata serê henara Ünîs û Evdîrehman,

Lê qewmê çiyê, hirçê kezzebşewitî, gurê serê dax û çiya E’ ji we ra sond dixwim, gêlî Silvana, Wê Newala Qeremûsê xwe rebeno bîkirîna gola xwîne Wey axayo li min ti nezan î, lê berxê bavê min o welle ti nezan î, Xwedayê mi’ zane ji qeza Sasîn ti gula makûm û firar û eşqîyan î, Li Gîrkelo ti qesabê serê teresê cendîrman î. Li çiyayê Xerza, ti çira bavê Eli û Evdîrehman î. Îro ketiye welatê Silvana. Erdê xerîb e, nenas e, Nizanîm te çima bi destê xwe agir bi xênîyê bavê min ve danî.

Lista foyan:

1. Ebdîrehmanê Eliyê Ünîs, 1938-Şam
2. Salihê Beynatî
3. Pîra Xerzan li Awîskê, 1933



Doman, domaniyî û ameyena jû netew

Meral Ozel

Çekûyê lej û şiddetê kî gire-dayî jûbinî. Çarçewê politîkayê îktîdaran de zorvajiye bi zonayis û sistematîk yena ramitene. Domanî rastê şiddetê yenê, rastê tacîz, tecawiz yenê...

Çekûya şiddetê ya kî zor kerdene her cayê ciwîyayîşî de vejîna virniya ma. Sernûsteyê şiddete ciya ciya yeno ra ziwan ardene. Hetê sosyolojîk ra bicarîme heta psikolojîk, ya kî tarîx de ca guretena na çekûya piya zaf sernûsteyî estî. Estê jû sernûsteyê şiddete; bi raya fizîkî ya kî hetê hissî ra royê însonî rê zerar dayena zorvajiye-herîş kerdene. Jû vatise bîna ke; jû kes ya kî civate rê raya fizîkî ya kî pêro piya kultur ra bicarîme heta ehleq, pêro rûmetanê mordemî rê herîş kerdene. Jû qeseyî de bîna ke; jû kes ya kî pêro civatî rê sifte bi raya psikolojîka zerar dayena.

Çekûyê lej û şiddetê kî giredayî jûbinî. Hama naca de bir rayana ciya ciya na zorvajiye-zor kerdene vejîna virniya ma. Hama ma tewr jêde di hetê şiddetî vejine werte. Lewê çekûyanê lej û politîka de na çekûya zorvajiye-şiddet yena kar ardene. Çarçewê politîkayê îktîdaran de zorvajiye bi zonayis û sistematîk yena ramitene. Navenda nayî de kî bi tersa hukumdariya xo pay ra guretene esta. Zerrê çeyî de kî no niyar ro. Qûweta kam kî resa kam iyê ser zorvajiye keno. Raya qesê xo ca ardene ke, bi vengê berz ya kî raya fizîkî, psikolojîka zor kerdene ra vereno. Vêreno çeyî de hetê jû kesî ra kî no plan yeno ramitene, hetê îktîdaran ra kî jêdena hîra, bi jû plan û sistematîka pêro civate ser na yena ramitene. Coka ma va ke, zaf hetî şiddetî estê.

Her hetî ra şiddetê xo misnena
Cenî, domanî, îtiqatê



ciya ciya, zerre civate de kesî ke dûstê îktîdarî de vengê xo kenê berz rastê zorvajiya de tewr pile yenê. Înan ser her hetî ra na şiddetê xo misnena. Hetê fizîkî, aborî, hissî, bi qese û cînsî mordem sero xo misnena, ciwîyayîşê mordem ser o tesîr kena. Zerrê çeyî de, hurendiya kar de, mektev de ya kî teber de, jû reyî ya kî xeylê reyan rastê şiddetî yemê. Hama şiddete ser domanan jêdena giran a û darvede pîl a.

Domanan ser şiddetede pîl esto
Çitûr kî mordem xo en jêde zerrê çeyê xo de zerrê tivariye de hîs keno. Domanî ke en jêde lewê malbata xo, zerrê çeyî de xo bi tivariya hîs kenê. Hama serva domanan endî nê malbatî, nê çeyî, nê kî sazîya ke alaquadarî bîngê tivariye ane ca ardene. Teyna hetê fizîkî ra nê hetê kamiya cînsî ra kî domanan ser şiddetede pîl esto.

Civate yena xerapnayene
Eke jû doman hetê fizîkî û royî ra bi weşiya de rinda ame pîl kerdene, no kî tesîrê xo ser civate keno. Hama jû doman kî bi ters, bi şiddet, bi pirodayena, bi qeseyanê xiravînan pîl bî, gunê bi xo ya lejî de pîl biderê. Mordemê niyanan pisporî vanê; tim royê xo de lete bi lete beno, kamayîşê însonî de tesîrê na şiddetê vejîno teber. Ya kî domane ke rastê tacîz û tecawiz ameyî, zaf rozanê giranan ra vêrenê. Reyna wes biyayena nê domanan waxtêde derg cena. Pêro rayanê ciya ciya yê şiddetî ma va ke ge-gane benê jû politîka. Eke hukumdari wastî jû qom, jû îtiqat, jû kultur, jû ziwan biqednê avê herîşî domanan û cenîyan kerdene nayî anê ca ardene. Niya jû civate yena xerapnayene. Niya jû qom raştiya xo ra dur, kamayîşê xo ra dur beno. Nê herîşanî verra domanan piya sifte îstîsmarê domanan hetê zanistî ra 1962 de ameyo kar ardene.

Kolekerdixî benê dewlemend
Domanî rastê şiddetê yenê, rastê



tacîz, tecawiz yenê. Jû hetî hem domanî hem kî benê veyvîke, jû hetî de hem domanî hem kî benê wayirê domanan. Jû gücîkê bîn de vesa-tesa manenê, teber de, hêgayan, palkayan de gurenê. Hona domanî hama jê kole gurenê û emegê înan ser kolekerdixî benê dewlemend.

Jû kes bi qoma xo, bi civata xo ya beno wayirê kamayîş. Jû civate ke bi domananê xo ya dewamê est-biyayena xo ana. Ganî domanî gorê kulturê civata xo bêrê pîl kerdene. Ciwîyayîşê însonî de cayê domanan zaf muhîm o. Gorê her kultur domanî ciwîyayîşê xo ciya ciya ramenê. Hem hetê aborî û hem kî hetê malbat û dormeyî ra. Domanîne çekûyede psikolojîk, sosyolojîk û tarîxî ya.

Seserra 21. de domanî...
Seserra 21. de domanan ser ra kî yew bazar vejîyo werte. Tayê iddia kenê ke serva heqanê domanan gurenê tayî ke vanê; ma serva ke domanî rind bêrê pîl kerdene gurenîme. Yew qeseyî de bîna ke pawitoxî, sosyolojî, tabîbî, malimî seweta aver şîyayîş û însonanê

rind pîl kerdene ser gurenê. Onca tayî welatê ke dîna de hukumdariye gureta destê xo, tim serva domanan projeyan virazenê, qeraran cenê. Hama nê qerarî ke seba heqanê domanan cerîne her ca de nêne kar ardene. Civatî û kulturî, heqanê domanan de sernûsteyî vërenê.

Haqê domanan...
Haqê domanan en jêde kî hetê ehleqî ra yenê naskerdene. Nê haqî jê weşiye, perwerde, ca biyayene, ver ra pêro herîşan sevîknayîsa yenê name kerdene. Qayîtê domanan biyayene, înan pîl kerdene û zerre civate de wayirê kamayîş kerdene mesela pêro homet a. Xeylê kulturê de heta 18 serrî her kes doman yeno diyayene. Gorê serranê însonan înan rê rol yeno dayene.

Benî hedefê pêro qileriya pîlan
Seserra 20. piya haqê domanan, hetê aborî û sosyali ra ciwîyayîşê înan û en jede kî tacîz û tecawizî verra domanan sero game ame estene. Hama lewe pêro nê gurenayîş û qeraran guretena welatanê ciya ciya de domanî her ke şî jêdena bî hedefê pêro qileriya pîlan. Bi serran o ke seba çarekerdena herîşanê verra domanan xebatî yenê ramitene.

Ma kî dîna de niyada doman û lej ganî qeyta mere tê lewe. Hama roza ewroyine de na seserra 21. de domanî na hardê ser en jêde rûare lejan ra dez oncenê, vesan manenê, rastê şidete yenê, benê muhacir kunê raya goc, bedena înan rê dest yeno estene.

Pawitîş û seveknayîşî domanan
Yewbiyayena Miletan kî seba he-

qanê domanan tayî qerarî gureti. Nê qeraran ra en taybet ke pawitîş û seveknayîşî domanan muhîm o. Raştiye de nê nêne xebitaniyîş. Nî hondayî ke qerarî. Kewt amo diyayene ke domane verra koledaran ame seveknayîş, dûste feqiriye de înan rê wayir amo vejîyayene. Eke niya mebo, çinay rê honde domanî na dîna sero vesaniye ra mirenê, lejan de mirenê, deryayan de xenekînê, riyê mektevan nêvînenê, bese nêkenê rind xo mird bikerî. Nî vatîşî pîlanî û waxte ke wastî anê kar ardene. Zovîna nî qerarî ke gurete cayî de nêne virniya însonî. Na vesanî, lej, zorvajiye ke pêro destê nî hukumdaran ra vejîna. Ca yo ke pêro nînan rê rayî dano, raştiye beno ke domanan rê jêdena hisdarî nejdî bibê. No kî jû hetî bînî yê plananê hukumdaran o.

Wayirê domanan bizejîme
Domanî, ameyena jû qomî, ameyena jû netew, ameyena jû ziwan û ameyena jû zagonî. Domanî çitûr benê pîl, kamayîsa xo kî nayî ser vejîna werte. Jû doman kî maya xo ra bî, dîna ra bêxeber o. Hama helme sifteya piya domanî rastê xiravîna pîlan yenê. Roz bi roz benê pîl, raştiya dîna nas kenê. Zerrê civate ke tey resenê gorê aye, ro xo de vînenê. Civat, rengê xo domanan ser misnena, domanan ser o tesîr kena. Civata ke ciwîyayîşê xo gorê esasanê xo yê kulturî, ehleqî, ziwan, demokratîk û tîdûst ramena, domanan rê kî raya na ciwîyayîşê rakena. Wayirê domananê xo, domananê ameyena xo, estbiyayena ziwan û kulturê xo bizejîme.

Wa Gulîstane nêra vîrîkerdene

Merkezê Xeberan

Wendekara Perwerdeyê Domanan ya Unîversîteya Munzurî Gulîstan Dokuya (21) ke Dêrsim de 5 çeyeyî ra nata vînbîyaye ya ra hema zî xeberêk çin a. Ganî Dokuye nêra vîrîkerdene û bêra vîrfînayene. Xebatanê vînbîyayîşî de hema zî tu netîceyêk nêameyo girewtene û hewl diyeno ke Dokuye bêra vîrîkerdene. Êdî medya daxî Dokuye vîrîkerda û derheqê aqûbetê Dokuye de xeberî zî nêni viraştene.

Babîyê manewî yê şikdar Zainal


Abakarovî Şubeyê Asayîşî yo ke cipersayîş yeno kerdene de xebityeno. Cipersayîş de têna îxtîmalê xokîştîşî yeno destgirewtene. Nê çiyî merdiman de şikê 'Gelo vindîbîyayîşê Dokuye de gîşt babîyê manewî esto ya nê' virazeno. Qey hende wexto ke Dokuye nêameya vînbîyayîşê? Dêrsim de gamê merdiman daxî yeno taqîpkedene, labele çî tesadufo ke her çiqas ke her çar goşeyê Dêrsimî bi mobeseyan piştene bo zî cinîyêk nîna vînbîyayîş.

Wina asiyo ke heta ke reaksiyonêko zêde nêro nişandeyene do no hedîse nêro roşnkerdene. Ma na rewşe

hedîse û qetliyamanê verênan ra baş zanî.

Sewbîna her hetî de bêvengîyêke virazîyaya û hewl diyeno ke Dokuye bêra vîrîkerdene. Hedîseyanê winasîyan de madur yena vîrîkerdene û her çî goreyê şikin û kedoxan ravêreno. Vengdayîşê ma seba şar û medya oyo ke ganî bêveng nêmanî û hedîse bidî vîrfînayene. Çiqas bêvengî biba do hende îstîsmar, tacîz, tecawiz û qetlkerdîşê vera cinî û domanan bizêdîyî. Cografayêka qedîm û xoverdayoxî de kerdişê winasî politikî î. Ganî vengê cinî û domanan bêro eşnawitene.





Mêrê bi sed mêrî

Dibêjin bazirganekî maldar hebû ji bo parastina karwanê xwe 7 parêzvanên wî hebûn. Carekê hevalekî bazirgan jê re got; "Ez mirovekî nas dikim ku mêrekî bi sed mêrî ye. Tu bi ya min bikî li şûna tu pereyan didî ewqas parêzvanan hema wî tenê bigire kar." Bazirgan jî tima bû û got li şûna ez pereyan didim 7 kesan ez bidim yekî bi tenê, ji min re jî baştir e.

Ez serê we neêşînim bazirgan bang li wî mêrê bi sed mêrî kir û hemû parêzvanên din ên karwanê xwe ji kar derxistin.

Piştî ku çûn barê karwanê xwe bar kirin û ketin rê, di newalekê de rêbir ketin pêşiya karwan û dest bi talankirina wî kirin.

Bazirgan li wî alî, wî alî çavên xwe li mêrê bi sed mêrî gerand lê ew nedît. Dawî dît ku xwe li bin siya darekê dirêj-kiyî ye û haya wî ji bayê felekê tune ye.

Serkêşê rêbiran hat ba bazirgan û jê re got divê tu 6 baran ji karwan bidî me. Paşê jî got divê tu hespa xwe jî bidî. Bazirgan bala xwe da parêzvanê xwe ku qet xwe ji cih nalebitîne.

Bazirgan ji serkêşê rêbiran re got tu çî ji barê karwanan dibî bibe lê tenê daxwazek min ji te heye.

Bazirgan destê xwe bi alî parêzvanê xwe de kir û got bila yek ji we biçe tiliya xwe bide qûna wî parêzvanê min ê ku li bin siya darê paldayî ye.

Çawa ku serkêşê rêbiran tiliya xwe da qûna parêzvan, ew ji cihê xwe vecinîqî û rabû ser piyan. Rêbir tev lê civiyan, lê nikaribûn serkêşê xwe ji nav destê wî derxînin. Mêrê bi sed mêrî kete nav wan rêbiran û tev teslîm girtin, ew perîşan kirin û tev bi darekê ve girêdan.

Mêrê bi sed mêrî berê xwe da bazirgan û jê re got te dît min çî bi serê wan kir. Bazirgan got; "Heyra welehî te ew perîşan kirin û tu mêrekî bi sed mêrî yî lê mixabin tu ji min re nabî, ji ber tu parêzvanê qûna xwe yî ne parêzvanê karwanê min î."

Îca ez serê we neêşînim bi her sî navê xwedê, gelek partî û sazîyên kurdan jî hene ku çîroka wan ji ya mêrê bi sed mêrî ne cudatir e. Tevî ewqas zordarî li gelê kurd dibin, hê jî ji cihê xwe nalivin û tiştêkî nakin. Helwesta xwe bi zelalî li dijî vê zilm û zordariyê nîşan nadin û wekî ku tiştêkî nebûbe jiyana xwe ya rojane berdewam dikin. Lewre dixwazim ji wan re bêjim heyra ma hûn li hêviyê ne ku wekî mesela mêrê bi sed mêrî li we were da ku hûn bikevin nav tevgerê û helwesta xwe li dijî zilm û zorê nîşan bidin. Bê guman li gorî dilê her kurdekî/e welatparêz bersiva herî bi wate ew e ku hemû hêzên kurd bi tifaqeke li ser bingeha berjewendiyên gelê kurd bîn ba hev.

Dildarê Amedê

Ma Batman gelek maye?

Weke di ser nivîsê de jî diyar e, ev bûyer li derdora Êlihê qewimiye.

Gava mirov xizan be, çerxa felekê li gor xizaniya wê dizivire. Kesekî xizan ji gundekî Êlihê ji bo pêdiviyên mala xwe dikeve rê dibêje heta ez xwe bigihînim ser rêya papolê wesayîtek were ez ê destê xwe lê rakim û ez ê herim navenda bajêr.

Dibe ku di bîra gelek xwîneran de be jî, di salên 1980-1985'an de dolmîşên wê demê ser wan bi baxaj bûn, asûkên rêwiyan hemû li ser baxajê bi cih dikirin. Ajokar şemedan an jî çadir bi ser de werdikir û girêdida, rêwî jî ajokar jî ji ber alavên xwe dilrehet bûn. Tu tişt badilhewa nayên gotin weke vê gotina pêşiyar, "DIRANÊ FEQÎ-RAN DI GEBÛLÊ DE DIŞIKÊ"

Rêwiya xizan û reben ji nav gundê xwe dertê, rêya papolê û gund bi nêvî dibe, rê çiqasî nêvî bûbe jî wê demê makîne pir kêmbûn bi saetan mirov li benda çûn û hatinê disekinîn.

Ji bextê wî rebenî re, demsala payîzê ye, seqemeke cemidî ba û bahoz lê radibe, giregira ewran û şîrçeşîrqa birûskan dest pê dike. Baraneke bi şerpîn dest bi barîne dibe.

Tu yê sond bixwî ku baran hikmê xwe nîşanî erdê dide, mirovê xizan li wê rasta reqîrût li bin baranê şilopilo û ji lephilanîn ve dikeve. Êdî baweriya wî dişikê û dibêje êdî taliya emrê min e. Li gor vê gotina pêşiyar "Xwedê delîlê midheyra ye"

Mirovê xizan lê dinêhere ji dûr ve dengê giregira makîneyekê tê. Ew baweriya wî ya şikestî hêdî hêdî cih dide hêviyeke mezin. Rêwiya xizan ji ber şilbûna ji baranê dibe rikerika diranê wî û lêvên wî



diricifin. Makîneya ji dûr ve dengê wê dihat, êdî gihîştibû rêwiya xizan. Ajokar jî ji kesekî xizmê wî çûye ber dilovaniya Xwedê û ji goristanê vedigerin. Lêbelê hundirê dolmîşê tije mirov in. Tu derfetên wî tune ne ku rêwiya xizan siwar bike. Ajokar li rewşa mirovê xizan dinêhere nebaş xuya dike. Ajokar jî rêwî re dibêje tu derfeta ez te siwar bikim tune ye. Lêbelê ez dikarim bêjim here ser dolmîşê, xwe bi baxajê ve bigire qet nebe ji sekinandina te wê çêtir be. Ji xwe niv saetê din em ê xwe bigihînin navenda bajêr. Mirovê xizan diçe ser dolmîşê ji ber ba û bahozê her ku diçe laşê wî dest bi tevizandin û pûçbûnê dike. Mirovê xizan lê dinêhere li ser dolmîşê

tabûtek heye, qapaxê tabûte bilind dike û dikeve hundurê tabûte. Êdî hikmê ba û bahozê lê nayê û xwe di hundurê tabûte de ker dike. Ew bi qasî 10-15 deqîqeyan bi rê de diçe lêbelê baranê venekiriye.

Hew lê dinêhere dolmîşê sekinî. Guhdarî dike, rêwiya xizan jî mîna wî tê ser baxaja dolmîşê ku hayûbaya wî ji rêwiya xizan tune ye.

Gava dolmîş dikeve ber palekê hêza wê kêmbû. Mirovê xizan qapaxa tabûte bilind dike û ji rêwiya xizan re dibêje, "Batman gelek ma? Rêwiya xizan dike gazî û xwe ji dolmîşê davêje jêr. Ajokar dike û nake rêwiya xizan tirsîyayî nikare bisekinîne.

Sabrî Vûral

Tev kurên kûçikan e

Carekê 3 heval li çoleke derdora Reqaya Sûriyeyê asê dimînin. Çend rojan bê xwarin dimînin û tu bajarekî an jî gundekî ku nêzî wan be, tune ye. Li wê çola xwedê ji hawhaw ketî dibînin ku guhên heywanekî wekî kîvroşkekê xuya dike. Yek ji wan dibêje hûn li vir bimînin carê dinêhere çavê wî li we ye ez ê ji paş ve herim belkî em wê kîvroşkê bigirin û zikê xwe pê tîr bikin. Welhasilî zilam diçe ji paş ve lê dizivire, digihîje nêzî wê, xwe qulûz dike û kevirekî li nav serê wê dide. Hîna difirfite xwe digihîne ser û wê serjê dike. Wiha hevalê wî jî pê ve tî. Yek ji wan dibêje kuro lawo ev rovî ye, yê din dibêje rovî rovî ye ma çî dibe, goştê roviyan jî tê xwarin. Yê din dibêje lawo roviyê çî bi xwedê ew wawîk e. Yê ku ew nêçîr kiriye dibêje de bese lo em ji birçîna ketin hûn çî dibêjin. Yek ji wan dibêje rovî, yê din dibêje wawîk. Rovî be jî, wawîk be jî tev kûçik kurên kûçikan e. Bi qesem ew kûçik be jî em ê goştê wî bixwin, kuro lawo li vê çola xwedê em ji birçîna mirin.



Xwebûn ji Azadiya Welat welidî

Încil Selçûk

Di jiyana mirovan de her tim tiştên yekemîn hene. Weke zaro- roka dê ya ewil, heval an jî hezki- rina ewil. Tiştên ewilî bin cihek wan ê taybet bi mirov re dimîne. Rojnameya “Azadiya Welat” jî ji bo jenerasyona me hem şanazî bû û hem jî bû mamosteya yekemîn.

Sala 1992’an, ez ne şaş bim dem- sal payiz bû. Ew 2-3 hefte bûn li ser hev ji rojnameya “Ulkede Gundem”ê reklama rojnameyeke kurdî dihate kirin. Em hemû malbat, dost û heval bi kelecaneke mezin li hêviyê bûn. Ji ber ku ji bo me derketina rojnameyeke kurdî wek xeyalekê bû. Tevî ku min li cem mamekî xwe yê li zanîngeha Camiû’l-Ezher xwendî nivîsa kurdî dîtibû jî lê ke- lecana rojnameyeke heftane keleca- neke pîr mezin dida min.

Sibeh zû bû jî mal derketim, min berê xwe da bayiye, pîrsa rojna- meyê kir. Li çend bayîyan geriyam peyda nebûn. Piçêkê jî min bi tîrs pîrsa rojnameyê dikir. Bi çavê xerîb li min temaşe dikirin, digotin rojnameyek wisa nîne.

Welhasil li cem yekî hebû lê, pere- yên di dest min de hûr nebûn. Zilam rojname û pere herdu dan dest min û got navê xwe bibêje û paşê perê xwe bîne. Tîrs û kelecana min li bin guhê hev diketin min newêrî navê xwe bêjim, min got, ‘avê min Necla ye.’ Zilam li ser kaxizek biçûk notek nivîstî danî wir û ez hatim.

Rojnameyeke kurdî di binçenga min de û li sîka bajarê Tarsûsê dime-

şim. Pehniya lingê min nedigihî erdê, wek balerînekê li ser tilyokên lîngan bi rê ve diçim. Dilê min di sînga min de hîlnayê, wek çiyayekî mezin bûye, dikim bifirim. Carna ji binçenga xwe derdixim li ser nivîsê dînihêrim û car- din dipêçim li aliyê ku manşet xuya neke. Ji ber ku tîrs jî bi min re heye. Wan rojan her roj dewletê davêt ser malên welatparêz û gelek kes digirtin.

Dem a gihîştim malê min rojname jî hev vekir, pel bi pel. Hema bêje sê çar rojan bê navber min ew rojname xwend bê ku bi temamî jê fam bikim. Lê bi îsrar min bi alîkariya beşa fer- hengê ya di rojnameyê de dihate we- şandin xwe gihand asta famkirinê.

Di wê navberê de çend zilamên jî malbata me derketin derveyî welêt. Wexta vedigeriya malê bi xwe re çend kasetên kurdî û kovarek biçûk bi navê “Serxwebûn” di nav pakêtên sa- bûnê û hwd. de bi xwe re tanîn. Êdî her ku çû nivîsa kurdî li derdôrê dihat dîtin. Lê Azadiya Welat di jiyana me ya rojana de cihekî girîng girt.

Rojnameya Azadiya Welat rojna- meya yekemîn a xwerû kurdî bû. Lewra êdî ew bûbû bar ketibû mil. Têkiliyeke xurt di navbera xwende- vanan û rojnameyê de hebû. Em di de- meke kurt de bûbûn hosteyê xaçepîrsa wê ya bi xelat. Hemû nivîskarên wê me weke ferdên ji malbatê dihesiban- din û her carê em bi meraq diman li hêviya hejmaran nû. Wexta hejmaran nû derdiket me despêkê xaçepîrs çêdikir û dişand bê ka ew ê kî xelatê bigre. Sê xelatên xaçepîrsê jî min girtin.

Wexta me xelat qezenc dikir û na- meyên xwende- vanan jî di rojnameyê



de derdiketin tîkiliya me ya bi roj- namê re xurtir dibû. Êdî malên ku Azadiya Welat neketayê me ew mal ji malbatan nahesiband, ew qasî xweş bi dildarî dihate belavkirin.

Di wê navberê de berdêlên gelek giran dihatin dayîn, dewletê bi hemû hêza xwe belavkirina wê asteng dikir. Li aliyê din jî serokkomarê demê Silo Demirel rojname dixist binçenga xwe li qada navnetewî di-

gerand dîgo aha binihêrim kurd li welatê me bi azadî rojnameyan jî derdixin. Mixabin her roj belavkarên rojnameyê heta xwende- vanên wê jî dihatin tehdîtîkirin û bi reşkujî diha- tin kuştin. Lê ne xebarokan serî li ber wan gefan ditewand ne jî xwen- devanan. Car kalekî 70 salî dikir bin- çenga xwe ve digerrand û car jî zarokekî 7 salî, lê rojname her hate derxistin û belavkirin.

Bi ya min sedema wê yekê; roj- nameyê xwerû bi kurdî û gelêrî bû. Lew di diroka de jî hatiye îspatkirin ku her tişta gel piştigiriya wê bike tîk nacê û gel barê wê hildigire. Îro jî encama wê rastîyê ye ku Xwebûn jê za û her xwende- vanekî/e wê roj- nameyê îro bûye nivîskarek ku bi dehan berhem afirandine û di wî çemî de diherikin û ew ê her biherike...

“Eger ez jî Xwedê netirsama, min dê ev gedeyê pîs bavêta ber kelemekê. Ji roja bîtye, me ribetîya xwe nedît. Nîba jî mimkûn e bi wî girîyê han me tîxe nava destê dijîmin.”

Bîranînên Min, Osman Sebrî Gelo we Sözcükler¹ Jean-Paul

Sartre (helbet ya bi wergera Bertan Onaran) xwendibe? Ku heya roja îro we nexwendibe, heye ku piştî wê nivîsê û piştî Bîranînên Osman Sebrî dest bavêjîne û bixwînin, hêviya min ev e. Jixwe we xwendibe jî, piştî wê nivîsê û piştî Bîranînên Osman Sebrî², ku di gelek mijaran de tiştên gelek girîng rêyî me daye -û hin jî dide-, hûn dê hewl bidin û bixwazin wekî seqaya edebiyatê bêhtir henasebar be, çawa bit edebiyat, qadeke bêhngirtinê ye û diçejejr, ango antîtoksik e.

Biçqasî ku em pê dizanin -û dinya û alem jî pê dizane-, Sartreyê fransî û Osman Sebrîyê kurdistanî bi tu awayî leqayî hev nehatine, ne di saxiya xwe de ne jî piştî mirinê! Ne li bajarekî Fransayê û ne jî li gundekî Kurdistanê! Ne Sartre qala Osman Sebrî kiriye ne jî Osman Sebrî qala wî û berhemda- riya wî! Sartre di 21’ê Pûşpera sala 1905’an de li Parisê ji dayika xwe bûye, ango bi Apê Sebrî re di heman salê de hatiye dinê û di 15’ê Adara 1980’an de jî li Parisê koça xwe ya dawîn kiriye. Osman Sebrî, di sala 1993’yan de çûye ser dilovaniya xwe, wekî ku bixwe jî dibêje, di navbera salên 1926-1972’yan de hejdeh caran³ ketiye zindanê, sê caran nefî bûye û salên mayî jî di bin çavdêriya polisan de jîyaye. Yek bûye pêşewa û nûnerê ramyarî û wêjeyî ya bîr û boçûna hebûnîtiyê (existentializm) û di Şerê Duwemîn ê Cihanê de jî aliyê almanan ve dil hatiye girtin, yê din bûye pêşewa û nûnerê tîkoşerî û gelparêziyê (nabêje welatparêzî) û bi



Weswese 2 Şener Ozmen

dû bidarvekirina herdu apên xwe (Şûkrî û Nûrî), xwe avêtîye nav der- yaya siyasetê, bê ku tiştêkî jê zanibe an bîrê bibê. Herdu jî serxwebûnxwaz in û jî azadiyê (û azadbûnê) hez dikin. Sartre Xelata Nobelê nepejirandiye û bi şûn de vegeandiye, Osman Sebrî sitemkarî û zorbazîya tîrkan nepejiran- diye û Xelata Eşîrtiyê bi şûn de vege- randiye ku ez ê qala wê yekê jî bikim. Tişta ku di jiyana herdu kesayeti- yan de -bêguman di nav peyvênwan de- car caran çav li me diqirpîne ku di pêş de jî dibe mijara gilî û gazincan, nîgaşa bavîtiyê ye ku bi nêzîktêdayîna li hemberî laşî derdikeve pêşiya me, çî ku bav û bavîtî, di heman demê de pergaleke dijelaşiyê ye jî. Digel ku Osman Sebrî gelek û gelek jî bavê xwe yî ku serokê eşîra Mirdêsan e hez dike jî, di beşa ku dûvedirêj qala bûyîna xwe û biçûktiya xwe dike de (piştî zewaca bavê xwe bi pênc salan, di 7’ê Çileyayê Pêşîn a sala 1905’an de li gundê Narincê tê dinyayê), tine di- bêje, “Bavê min gelekî jî min teng bûbû. Wê çaxê wan bawer dikir ku zarokek xwedî bext û bedbext dibe. Ji ber ku bi bûna min re ev bela batibû serê eşîrê, ez bedbext hejmartî bûm.” (O. Sebrî, r. 27)

Çi ku Osman Sebrî jî kama xwe ve kin e, her weha bavê wî jî (... ji ber ku bavê min bixwe payeyekî biçûkê bû, ma gava ez biçûkê bûma guneb bûl?), çaxê di civata eşîrê de serê giliyan vedibe û gotin awayekî jî awayan tê ser qelsî û kêmiya wî, bav xwe nema radigire û

Jean-Paul Sartre û Osman Sebrî



dibêje,” Ma gelo heye ku Osman jî wekî her kesî girs bibê û holê biçûk nemîne?” li ser wê pîrsa wî ya tewş, rîspîyekî eşîrê tine dibêje; “Sebrî! Ez di- bînim bûn çend car tu vê yekê han jî kesên dora xwe dipîrsi. Ma gelo gîrsî ber tiştê? An biçûkbûn kêmtî ye? Ez bawer im ku Osman ji te biçûktir namîne.” (O. Sebrî, r. 28), jixwe namîne jî!

Em di wêneyê ku li ser bergê pîr- tûka Jean-Paul Sartre hatiye bikara- nîn de, piştî serê zarokekî kurîn û xwendekar dibînin; ango gedeyekî sermezîni û girover î gubhesk, helbet bi paştûyekî çîçelaskî. Gava şewba tîfoyê dikeve Kurdistanê (sala 1915’an) û qîra xelkê -xasma jî a za- rokan- tine, Osman Sebrî hêna deh salî ye û di pola sisêyan de ye. Gelek kes -yek jî ew e- bi wê nexweşiya malkambax (gotînê wi ne) dimirin ku bavê wî û mamosteyê wî jî di nav



ên çûyî de ye. Şopa nexweşiya ku di can û cendekê wî de hiştiye, wêneyê wî tîfalîşanîmin dide; “... li ber ney- nikê xwe şîlf û tazî dikir û li cendekê xwe dinêrim; ka tiştêkî jê zêde bîtye, an na! Her gav diravê ku min xwe tê de didît ev bû: Serîyekî mezîn, du çavên bel, rîhyekî çivîr, sîthyekî zîran, zend û ranên min bê goşt, heya bi çermê min di rengê ariyê de, bi tevayî cendekê min tiştêkî kirî bû.” (O. Sebrî, r. 32)

Baş e bav? “Bavê baş tune ye...” dibêje Sartre û bi ser ve dike; “Ev e rê û rêzîkeke; lê ne jî bo mîran, divê em li tîkîliya bavîtiyê ya rîzîyayî zivêr bibin.” (Sartre, r. 16) Lewre çî gava Osman Sebrî qala eşîrtiyê dike, gelek caran peyvek an du peyvên nerênî jî bi teriya wan ve dike û hêja bi kar tine, wek mînak; siwarî, şer- vanî, rê û rêzana eşîrê nasîn, serokê eşîrê, şungîr, rêzana eşîrî ya şaş û

çepel, zor û zorbazî, gund, axatî, kêmi û kirêtiyên eşîrê, mezinatiya eşîrê, gelş û qîrên, şewr û tevdir, tevgera eşîrî, koçer, mezinatî, qîrên û berberî, lihevnekirin, rîk û dexs, pîsmîr û rîspîyên eşîrê, bira, koç- berî, şer, mîr, xwîna kuştîyan, lihe- vanîna, goristan, segên kuştî, bav, erd, rêça eşîr û malbatê, dubendî, şer û lîdan, eşîrên dijîmin, eşîr û malbat, tîfing, def, govend, ûrt, dûyê cigareyê, dengê box, rî û sim- bël, zad û çandîni, axayê sitem- kar...” Xuya ye ew bi xwe biçûkayî bolê nehatibû eşandin, an ma çawan zarokekê bê listîk û keen, bê gelş û qîrên dikare di nav peyan de bîjî? Nîzanim bavê min dixwest jî wî gedeyê xwe yê bimêris çî bi derxista?” (O. Sebrî, r. 30) Sartre jî, bi van gotinan amaje bi mirina bavê xwe dike; “Mezintîrîn bîtyer di jiyana min de, mirina Jean-Baptisteyî bû: Kir ku dîya min carîna li qeyd û zîncîran bi- keve, lê azadiya min jî şabasî min kir.” (Sartre, r.16)

Serqîse Osman Sebrî, tekane mîrxas e ku li Kurdistanê ramana hebûnîtiyê (existentializm) bi jiyana xwe, bi kir û kiryar û bîr û boçûnên xwe yên bo serxwebûna gelê xwe berceste kiriye, badilhewa nîne wekî mirovpûxta xwebixwe diafirîne; bi ketina li dinyayê, bi şer û pevçûnê, bi eş û jan kişandina li wir û ev rêya han her û her vekiriye.


1- Sözcükler, Jean-Paul Sartre, Weşanên Payel, 1989

2- Bîranînên Osman Sebrî, Weşanên Aram, 2004

3- Di Tarîxa Edebiyata Kurdî a Prof. Qana- natê Kurdo de, ev hejmar wekî duwanzdeh caran hatîye dîyarîkirin ku Qana- natê Kurdo ve agabîyê dis- pêre pêgotîna Henreyê Resoyî ya jî bo dîwana Osman Sebrî ‘Apo’yî re nivîsandî.

Keştiya Alalû

Agît Yazar



Efendiyên welatê jor

Wexta min dîroka Xaltî-Ûrartûyan vekoland, yek caran ez bextewar bûm, yek caran xemgîn bûm, yek caran kelecane ez girtim û yek caran jî henase/bîhn li min çikiya.

Li ser rûyê vê dinyalîkê, ti şaristaniyeye din weke Ûrartûyan ev çend mutewazî, mirovhez, afirîner û xwediyên nîrxên bilind nehatiye dîtin.

Meriv çiqas wesfê wan mirovên henûn, zîrek, kêrhatî û ehlên jiyana xweşguzarî bide jî, dîsa meriv dibêje qey têra ciwanmerdiya wan nake.

Ûrartûyan, ti carî ji bo desthilatdariyê bi hev re şer nekirine. Qralên Ûrartûyan, wexta qala îcraetên xwe kirine, ewil navê xwe û paşê jî navê bavê xwe hildane. Çaxa derketine cengê jî, dia ji xwedayê xwe re kirine. Herdem xwe ji xwedayê xwe re nizm kirine. Peyker û kêlberên (rulyef) xwedayên xwe çikandine, lê peyker û kêlberên şexsên xwe nedane çekirin û neçikandin.

Ûrartûyî, xwediyê baweriyeye pîr-xwedayî bûne. Navê serxwedayê Ûrartûyan, Yezan Xaldî ye. Di heman demê de Yezdan Xaldî, yezdanê şerr e jî û xwedayê wan ê neteweyî bûye. Navê hevîna Yezdan Xaldî, Xwedawend Arûbanî ye.

Hemû qralên Ûrartûyan, serkeftinên xwe yên di şerr de bi hêza Yezdan Xaldî ve girêdane. Ev yeka hanê bi me dide selimandin ku Ûrartûyan, di şerran de û di her astengiyên giran de, motîvasyoneke mezin ji Yezdan Xaldî wergirtine. Yezdan Xaldî, li ser piştê şerekî hatiye sêwirandin. Ji gewdeyê wî aleviyên agir vêdikeve û rîma wî ya navdar bi aleviyên agir pêxistî ye.

Ûrartûyan ewqas bi xwedayê xwe ve girêdayî bûne, li her bajarên xwe perestegê û mabedên olî ji Yezdan Xaldî re nezir kirine.

Em ji vê rewşa hanê serwest dibin ku yewnanan, çanda nezirkirina perestegê a ji bo xweda û xwedawendên xwe, bi temamî ji Ûrartûyan wergirtine. Selimandina vê yekê jî ew e ku mîmarîya perestegê yewnan, hema hema ji ber perestegê Yezdan Xaldî hatibû nezirkirin û qopî kirine.

Yezdan Teişeba jî, xwedayê ba û bahozê ye. Li ser piştê ganêrekî hatiye



sêwirandin û gurzek tîrêjên birûskan di destê wî de ye.

Yezdanê di rêza sêyemîn de jî, Yezdan Şivînî ye û ev jî yezdanê rojê ye.

Li ser deriyê Mehîrê Yezdan Xaldî, navê 79 xweda û xwedawendan nivîsandî ne. Ji van xweda û xwedawendan 63 heb mêr û 16 heb jî jin in. Ji bo van xweda û xwedawendan, her sal dewarên sitûr û pez ji wan re hatine nezirkirin.

Ji ber navê seryezdanên wan Xaldî bûye, wan jî xwe wekî miletê Xaldî bi nav kiriye. Yek caran jî ji xwe re gotine Bîanîlî, ango Bîyanîstan. Lê cîranên wan, nexasim jî Asûran ji wan re gotiye Ûrartû û Naîrî. Ûrartû tê wateya Qewmê Çiyayî û Naîrî jî tê wateya Qewmê Çeman.

Em Ûrartûyan nas bikin

Piştî Mitanî jî hêla asûran we têk diçe, hemû kurdên deştî xwe li êlatên azad ên li derdora gola Wanê digirin. Ev êlatên azad, hürriyên Zagrosî bûne û ew jî pêşiyên kurdan e. Her êlek, serbixwe bûye û qralekî wê hebûye.

Di sedsala 13'êmin de, qralên asûran ji bo huner û xezeba xwe raberî herkesî bike, êrîşî ser van êlatên li derdora gola Wanê dikin. Qralên asûran di salnameyên xwe yên şer de dîwîsîn dibêjin: "Me êrîşî ser welatê Ûrartûyan kir. Mîna çûka di ser hêlînê de me dest danî ser wê û hêkên wê. Me ji serê wan ê jêkirî, pîramîd

çekirin. Newal ji laşên wan tije bû û laşên wan mabû di nav xwîna xwe de. Me 8 welat û 51 bajarên wan şewitandin û wêran kirin." Ev êrîşên asûran ên bêeman, derdora 400 salî dajo. Her cara qralekî Asûrê nû derdikeve ser text, derdikeve nêçîra xelkên cîranên xwe, nexasim jî xelkên Xaltî-Ûrartûyî

Ti miletî bi qasî asûran, wesfê qetlîamên xwe nedane û bi dilbijandinek ev çend mezin qala xwînrijandina mirovan nekiriye. Meriv ji xwe re dimîne heyirî, ka çawa insan dikane ewqas bi herikandina xwîna însanan kêfxweş bibe û bi vê hezê kêfxweşiya xwe bîne ziman.

Asûr, ji qewmê samî ne û ji başûrê Afrîkayê hatine. Xezeba wan bi ser kevir û daran de nebare! Bi hêsani meriv dikane bibêje, heke ne ji komkujiyên asûran bûya, niha serjimara kurdan ew ê bi sed milyonan bûya. Ez dixwazim hinekî din vê îdiaya xwe bi pêş ve bibim: dîsa heke ne ji komkujiyên dewleta Asûr bûya, niha gelek dewletên dinyayê bi kurdî diaxivîn!

Pêşiyên asûran, ango qralên akadiyan bi xwe gotine, ewqas qewmê Zagrosan pir in, hejmara wan bi qasî stêrkên ezmanan dibiriqe. Qewmê Zagrosan jî, pêşiyên kurdan ên hingê ne.

Hêjayî gotinê ye ku ti caran kurdan rê nedaye ti kesê, heta dijminê wan werin hikum li Zagrosan bikin; hîn jî hukumdarên Zagrosan, tekane qewmê kurd in. Her çiqas berdêlên pir giran jî dabîn, ev çarenûseke neguherbar e û hukmê ti kesê nagihêje heta vê çarenûsê biguherînin. Meriv dibêje qey ev fer-manekê xwedayî ye!

Dewleta Xaltî-Ûrartû

Lûtîprî, merivekî gelekî zana û jêhatî bûye. Lûtîprî, temamên êlatên welatê Xalta dicivîne ser hev û yekitiyek xurt di navbera wan de ava dike.

Lûtîprî yê zana û wêrek, cara duyemîn temelê dewleta Xaltî-Ûrartûyî B.Z di sedsala 9'êmin de datîne. Ev yekitiya êlatên Xaltîyan, xwe li hemberî êrîşên dijwar yên artêşa nîzamî ya Asûran xwe li ser piya digirin û Asûran paş ve dehf didin.

Sardûrî yê kurê Lûtîprî B.Z di sala 832'an de dibe qral û Qral Sardûrî, ji bo xwe jî êrîşên muhtemlên

Asûran bihefidîne, serbajarê welatê xwe koçî Tûşpayê dike û li ser bilindahiya Tûşpayê, kelateke niwaze ava dike.

Qral Sardûrî, li ser diwarê keleha Tûşpayê wiha dinivise: "Nivîsa Sardûriyê kurê Lûtîprî; qralê mezin, qralê bihêz, qralê cihanê, qralê welatê naîriyan, qralê raqîbê wî tine, şivanê gel, qralê ji şerr natirse. Ez Sardûrî kurê Lûtîprî, qralê qralan, qralên ku ji hemû qralan xwîkiyê (xeracê) distîne. Sardûriyê kurê Lûtîprî wiha diaxive: "Min ev kevir ji bajarê Alnûnûyê (Xelat) û ev diwar ava kir."

Piştî Sardûrî, kurê wî Îşpûnî dibe qral û Îşpûnî îdarekirina welatê xwe, bi kurê xwe Menûa re parve dike. Meriv dikane bibêje bav û kur bi hev re dibin qral. Ev yeka hanê, bawerî û ezmûneke mezin dide qral Menûa yê ciwan. Piştî mirina bavê xwe jî, qral Menûa peywira xwe, bi awayekî bê qusûr tine cih.

Tûşpaya paytexta welatê Xalta-Ûrartû tam 100 salî malovaniyê jî miletê Xaltayî-Ûrartûyî re dike. Tirba pênc heb qiralên Xalta di tahtên asê yên Tûşpayê de hatine kolan. Her yek ji wan tîrbên bîrdarî, yek ji ya din niwazetir e. Ew tîrbên hanê bi hostahiyeke were hatiye çekirin, meriv fedî dike ji xwe re lê binihêre.

Ev tîrbên bîrdarî yên qral Sardûrî yê Iem, Îşpûnî-Menûa, Argîştî û Sardûrî yê 2'yemîn, ewqas dêwasa mezin in, her yek ji wan artêşek dikane xwe tê de veşêre.

Ji ber ku Îşpûnî û kurê wî Menûa di heman demê de bi hev re welatê xwe îdare kirine, her du qral jî di yek tîrbê de hatine definkirin...



Qral Menûa û êrîşên aramiyan (ermen)

Gelê aramî ango gelê ermen, nola begligek piçûçik, li bakûrê Îdirê dijyan. Di serdema qral Menûa de, keleş û rêbirên aramiyên pêşiyên ermenan, êrîşî ser mal û milkên gundiyan Kaxizmana Qersê dikirin. Ev êrîşên hanê ji mêtî ve pêk dihatin û gelê herêmê ji van êrîşan bêzar bûn. Li ser vê yekê gundiyan Xaldî, giliyê van destdirêjiyên aramiyan li cem qral Menûa dike. Qral Menûa pir hêrs dibe û leşkerên xwe dişîne ser vê begliga ermen û wan tevdekan dîl digrin û tînin Tûşpayê. Bi vî awayî em serwest dibin ku xelkê ermen B.Z di sedsala 8'êmin de ji hêla qral Menûa ve di nav axa welatê Xalta de, nexasim jî li derdora gola Wanê tê biçikirin. Di nav demajoyê de xelkê ermen êdî wê herêmê wekî welatê xwe dipejirînin.

Ji vê yekê tê famkirin ku, gelê ermen ji Xaltî-Ûrartûyan hînî hunera diwarlêkirinê bûne. Lewra gelekî berî xelkên ermen, miletê Xaltî-Ûrartûyan kelat û perestegê niwaze avakirine.

Qral Menûa, xizmeteke pir mezin ji xelkê xwe re dike û asta xweşguzariyê derdixîne asta herî jor. Coaveke zêdeyî 50 km dikole û tîne berdide nav zevî û bajarê welatê Xalta. Li her derê rezên tîrî datîne û şeraba pîr xweş ji wan rezan hildiberîne.

Menûa, wan rezan ji jîna xwe Tirîlîlayê re nezir dike. Xwînêrên hêja! Ev navê Tirî û Tirîlîlayê bi we jî balkêş hat ne wanî? Tê gotin ku wexta gelê ermen çûne Fransayê, ji rezên Wanê ango ji rezên Menûa, tovên tîrî bi xwe re birine û li wir çandine. Roja îro, şeraba navdar a Nice û Lyon a Fransayê jî ji wan rezan tînen hilberandin.

Tê gotin ku wexta gelê ermen çûne Fransayê, ji rezên Wanê ango ji rezên Menûa, tovên tîrî bi xwe re birine û li wir çandine. Roja îro, şeraba navdar a Nice û Lyon a Fransayê jî ji wan rezan tînen hilberandin.

Qral Sardûriyê 2'yemîn

Di serdema qral Sardûrî yê 2'yemîn de, firehiya hikumdariya welatê Xalta, digihêje sînorê xwe yê herî mezin.

Êdî ji deryaya Xezarê bigre hetanî Deryaya Reş, ji wir hetanî Kapadokya û heta welatê Kilikayê ango heta paravên Deryaya Sipî û heta qismekî Mezopotamyaya jêrîn, dikeve bin hikumdarî û bandora qral Sardûriyê 2'yemîn.

Wexta Sardûrî yê 2'yemîn xwe li çemê Firatê dixîne derbasî rojavayê Firatê dibe, welatê Melfîteyê vedigre û li ser tahtê rexa Firatê wanî dinivise: "Yezdan Xaldî bi rîma xwe daket cengê. Qralê welatê Melfîteyê Hîlarûdayê kurê Saha têk bir. Ew li pêşberî Sardûriyê kurê Argîştî li erdê xist. Yezdan Xaldî bihêz e,

rîma wî jî hêzdar e. Sardûriyê kurê Argîştî derket seferê. Sardûrî dibêje: "Çemê Firatê aram bû. Ti qral nikarîbû li vir xwe li çemê Firatê bixista. Ji ber ku min ji mezinahiya wan a Xwedayî alîkarî xwest, ez li ber Yezdan Xaldî, Yezdan Teişeba, yezdan Şivînî û hemû yezdanên welatê Bîanîliya geriyam û lava kir, wan jî dengê min bihist û rê şanî min dan. Li ber bajarê Tûmîşkî ez bi şervanên xwe re derbasî wî aliyê çem bûm. Ez ji başûrê welatê Qalaniya derbas bûm, ez gihastim çiyayên Karnîşiyê yên ku dikevin bakûrê Meletiyê. Ez heta welatê Mûşayê bajarê Zapşayê bi pêş de çûm. Di rojekê de min 14 kelat û 80 bajar (gundê hingê) xistin destê xwe. Min kelat wêran kirin û bajar jî şewitandin."

Dema qral Argîştî

Piştî qral Menûa, Argîştîyê yekem derdikeve li ser text û dibe qralê çaremê welatê Xalta. Qral Argîştî di şerê li hemberî dijminê xwe de gelekî dijwar bûye.

Qral Argîştî, berevajî hukumdarên kurdan çî yên berî xwe û çî jî yên piştî xwe, qet dilê xwe bi dijminê xwe neşewitandîye. Ji ber vê taybetiya qral Argîştî, navê ku di kurdîya roja me de tê wateya Arê-geş li xwe kiriye û ji xwe re gotiye Argîştî!